ÇAND Û SINC

AMADEYÎ

2

2019/2020

AMADEKAR

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Çand û sinc ve hatiye amadekirin.

LÊVEGER

- Komîteya Şopandinê

- Komîteya Fotoşopê

- Komîteya Redekteyê

Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.

NAVEROK

AWAYÊN ÇANDÊN BINGEHÎN ÊN MIROVAHIYÊ 7

ÇANDA KLANÊ 10

ÇANDA KOÇBERIYÊ 14

ÇANDA JIN Û XWEDAWENDÊ 19

ÇANDA HOZ Û EŞÎRÊ 23

ÇANDA PARASTINÊ Û ÇÊBÛNA ETNÎSÎTE Û NASNAMEYÊ 26

ÇANDA ŞAMAN Û RAHÎBAN 29

DERBASBÛNA SERDEMA HIYERARŞÎYÊ 33

DERBASBÛNA CIVAKA HIYERARŞIYÊ 37

ÇANDA ZÎGÛRATÊ 41

ÇAND Û SINCÊ BAJÊR 43

ÇANDA BAJARÊN KEVNAR 48

ÇANDA BAJARAN A DI NÛJENIYÊ DE 51

ÇAND Û SINCÊ DEWLETÊ 53

ZAGON DI DEWLETÊ DE 56

QIRKIRINA ÇANDA CIVAKÎ 58

LI HEMBERÎ ÇANDA KOLEDARIYÊ ÇANDA KOMÎNAL ... 60

BERXWEDANA HOZ Û EŞÎRAN 62

ÇANDA PÊXEMBERIYÊ- 2 67

ZERDEŞT- 1 70

ZERDEŞT- 2 73

BÛDA 76

KONFUÇYÛS 79

MANÎ- 1 86

MANÎ- 2 89

WANE 1

AWAYÊN ÇANDÊN BINGEHÎN ÊN MIROVAHIYÊ

Mirovahiyê, ta niha du awayên pergala nirxan afirandine. Ji van a yekem a ku mirovahiyê diafirîne û dibe sedem ku mirov weke hebûnekê li ser rûyê erdê jiyana xwe bidomîne, pergala **nirxên komînal** e.



Pergala dewletparêz û desthilatdar

Em îro vê pergala nirxan, weke çanda komînal a demokratîk bi nav dikin.

Çanda komînal, li gorî pêwîstiyên jiyana civakî tê afirandin. Ev afirandin, li gorî leza veguherîna civakê çêdibe.

Aweyekî din ê afirandinê ya ku em jê re dibêjin; **civaka dewletparêz** û **desthilatdar** a serdest e.

Ji ber vê yekê, mirov dikare bêje; ev her du awa yan jî pergal, di nirxên berhemên çandê de xwe didin der.

Desthilatdarî, di bingeha xwe de tu çandê nafirîne, lê ew dest datîne ser çandê û ji cewhera wê dûr dixe. Diyardeyên weke; paşverûtî, dûrxistina ji bingeh û teng hizirîn; têgehên çanda desthilatdariyê ne.

Di navbera çanda dewletparêz û çanda civaka komînal de hin cudahî hene, lê ya rastir her du dijberî hev in.

Çanda komînal a demokratîk (Civaka xwezayî)

Civaka xwezayî, destpêka hebûna mirovahiyê ye. Mirovahiyê kariye cara yekem bi civaka xwezayî re weke hebûneke civakî derkeve holê.

Ya ji beriya vê, jiyana lawirî ye. Pergala civakî ya dewletparêz û hiyerarşîk, li dijberî civaka xwezayî pêş ketiye. Civaka xwezayî, pergaleke wiha demdirêj e ku bi qutbûna mirov a ji prîmatên ku herî nêzîkî cureya mirovan dest pê dike.

Civaka xwezayî

Bi derketina civaka hiyerarşîk re civaka xwezayî ji cewherê xwe derdikeve.

Civaka xwezayî, kariye li her cihê ku mirov lê jiyan kiriye, hebûna xwe nîşan bide. Weke hebûneke civakî, temenê mirovahiyê ji % 98 bi jiyana civaka xwezayî re derbas bûye.

Pergalên hiyerarşîk û dewletparêz, tevî ku bi nirxên civaka xwezayî jiyan kirine, pir bi zanabûn civaka xwezayî mandel kirine, dîrok ji xwe dane destpêkirin.

Bi gotineke din, ji civaka xwezayî re civaka mirovahiya **paleolîtîk û neolîtîk** jî tê gotin.

Mirovahî, di civaka xwezayî de bi hezarê salan bi awayê klan, hoz û eşîrê jiyan kiriye. Pêwîst e, em van awayên jiyana civakî bi berfirehî û kûrahî lêkolîn bikin. Gelek têgehên weke; dayîk, xwişk û biratî, azadî, wekhevî, berpirsyarî, ked, dad, hevkarî, comerdî, mêrxasî, lehengî, cejn û hwd. ji civaka xwezayî tên. Çanda ‘dayîk’ û ‘xwedewanda dayîk’ mohra xwe li civaka xwezayî dane.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Awayên pergala nirxan ên ku di mirovahiyê de hatine afirandin, binivîse.**

2- **Çend têgehên çanda desthilatdariyê, binivîse.**

3- **Kengî civaka xwezayî dest pê kiriye?**

4- **Dema ku civaka xwezayî ji cewherê xwe hatiye dûrxistin, kîjan pergal hatiye avakirin?**

5- **Di dîrokê de kê mohra xwe li civaka xwezayî daye?**

WANE 2

ÇANDA KLANÊ

Şaneya kok a civakê, **klan** e. Mirovahiyê, piraniya temenê xwe (ji % 98) bi awayê klanê jiyan kiriye. Mirovahiyê, di dîroka xwe ya li ser rûyê erdê de cara yekem bi avakirina civakê, ji lawiran cuda bûye û ji destpêka vê pêvajoyê re serdema **paleolîtîk** tê gotin.

Ji vê civaka yekem re **klan** tê gotin. Pêvajoya klanê, şêwaza yekem û bingehîn a awayê hebûnê ye.

Klan; çêbûna civakê, bîra wê ya destpêkê û bingeha pêşketina têgehên weke; zanabûn û baweriyê ye.

Ji ber ku mirovên seretayî, di wê serdemê de kevir bi kar tanîn, ji ber vê yekê di wateya serdema kevirê kevn de serdema **paleolîtîkê** hatiye gotin.

Vê serdemê, sed hezar sal dewam kiriye. Klan, civakeke ku hejmara wê digihêje 20-30 kesî û ji yekîtiyeke ku li derdora jinê kom bûye û weke malbatekê pêk hatiye ye.

Naskirina xweza û hebûnên xwezayê, di vê qonaxê de pêk hatiye. Hîn jî, em nikarin qala nasnameyê bikin. Teşeya tîmarbûnê, nêzîkî ya lawiran e. Klan bi piranî, di kokên daran, şkeft û li nêzî rûbaran de jiyan dikin. Piranî, jiyana xwe bi komkirina giya û nêçîrvaniyê re bi tiştên ku peyda dikin,

berdewam dikin. Tiştên ku bi komkirinê bi dest xistine, ji bo hemûyan e. Jin, bi komkirina şînatiyan û zilam jî piranî bi nêçîrvaniyê re mijûl dibûn. Karbeşiyeke bi vî awayî her ku biçûya, wê kesayetiyek û çandeke cuda biafirandina.

Klan, ji ber ku ne civakeke yekdest bû, hîn jî mirov nikare behsa pirsgirêkeke civakî bike. Her çi qasî ku vedîtina agir û amûran bi pêş biketa, wê ew qasî jî mirovbûn bilez bibûya. Awayê yekem ê ku tê de çandbûn çêbûye, klan e.

Çêkera Sincî Ya Klanê

Klan, ji ber ku civaka yekem a mirovahiyê ye, ji derveyî klanê jiyaneke cuda nayê hizirîn. Her endamê klanê, dizane ku hebûna wî/wê girêdayî hebûna klanê ye. Ji ber vê yekê, bi zagona “**eger nebe, nabe**” girêdayî klanê ye. Li gorî vê, endamekî/e klanê, nabe ku di klanê de jiyaneke cuda bihizire.

Di klanê de rêgeza “**an giştî, an jî qet**” bingeh e. Ji bo endamên klanê, kesayetek û biryareke cuda nayên hizirîn. Awayê civaka klanê; bê cudahî, bê hiyerarşî, bê çîn û bê kedxwariyê ye.

Di jiyana klanê de sinca herî mezin; di nava civakê de bi hevkariyê jiyan dikirin, kesên bêsinc jî; ji derveyî civakê diman (weke ku dihatin qewitandin). Ji ber ku bi civakê re hêz peyda dibe û derdikeve holê. Ji derveyî civakê jî, tunebûn heye. Ji ber vê yekê, mirov dikare bêje; ev rêgez, rêgeza herî bihêz a jiyana mirovahiyê ye. Ev rêgez, nûneriya sincên bingehîn ên serdemê dike.

Em dikarin ji klanê û jiyana wê, encameke bi vî awayî derxin holê; civaka yekem a cureya mirovahiyê ye, pêşketina mirovahiyê bi xwe spartina rêgeza hevkariyê pêş ketiye. Ango weke tê bawerkirin ku têkiliyên weke desthilatdarî, berjewendî û çavdêrî di nava vê qonaxa destpêkê de tune ne.

Her wiha, tê hizirîn ku ev civaka klanê di hembêza xwezayê de jiyan kiriye.

Têkiliya mirovahiyê; weke girêdana di navbera zarok û dayîkê de ye. Ya bingehîn, têkiliyeke ne ji xwezayê qut e, bi xwezayê re yekparebûnê bingeh digire.

Xwespartina hêza jinê ya klanê, bi awayekî hevsengî di hembêza xwezayê de jiyan kirin û çêbûna nirxên komînal nîşan didin, ku mirovahî bi nirxên mirovî ên pir bihêz re derketiye holê. Ev di heman demê de nîşan dide ku di vê qonaxê de civakbûneke baş çêbûye.

Di şêwaza jiyana klanê de têgehên wekhevî û azadî ji ber xwe ve hene. Ev rastiyeke girîng e. Îro jî, têgehên ku bi zanabûn tên bikaranîn, ên weke; azadî û wekhevî hene, ku bi saya jiyana klanê ne.



Totem

Şêwaza baweriya klanê; **totem** e. Totem; an lawireke an jî şînatî û tişteke ku di jiyana mirovan de herî zêde berhemdar e. Sembola klanê, **totem e**. Totem; tabû û pîroz e. Di baweriya totemê de têkiliya serdestiyê tune ye. Totem, pîroz tê dîtin û jê re rêz tê girtin. Totem; zanabûna klanê nîşan dide.

Klan; totemê ji dema borî ta roja îro di nava xwe de dide jiyankirin. Bi kurtasî, mirov dikare bêje; totem nasnameya klanê ye. Klan; bi totemê ve tê girêdan, ji wê hêzê digire û wateyekê dide hebûna xwe. Ta niha li Hindistanê, çêlekê weke totem pêk tînin. Ev jî, ji vê çanda totemê tê.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Serdema paleolîtîkê, pênase bike.**
2- **Klanan, li ku derê jiyan dikirin û tîmarbûna wan bi çi awayî bû?**
3- **Rista jin û zilam a di klanê de diyar bike.**
4- **Awayê jiyana civaka klanê, çawa bû?**
5- **Kîjan têgehên sincî di klanê de hatine diyarkirin?**
6- **Şêwaza baweriya klanê, bi çi dihat kirin û çima?**

WANE 3

ÇANDA KOÇBERIYÊ

Vê çandê, di serdema klanê de û piştre jî berdewam kiriye. Di vê serdemê de jiyan bi tevahî ne niştîcih e, di nava xwe de komînal e.

Klan, di nava xwezayê de bi hev re jiyan dikirin. Li gelek herêmên cîhanê, ev çand hîn jî jiyan dike. **Mînak**: Jiyana koçerên ku li Kurdistanê dijîn, berdewamiya vê çandê ye. Koçer; bajar û çanda bajêr nas nakin. Bi piranî, bi çanda şivanî û lawirvaniyê ve jiyana xwe didomînin. Di vê çandê de azadî pir e. Demsal û xwezayê, baş nas dikin. Ji ber ku, çanda ji xwezayê sûdê digire ya herî baş e, taybetmendiyên wê yên ekolojîk di jiyanê de xwe didin der.

Civaka xwezayî

Çanda neolîtîkê

Çanda neolîtîkê, çanda ku ber bi dawiya civaka xwezayî de hatiye jiyankirin. Di heman serdemê de taybetmendiyên herî xwezayî yên civaka xwezayî hatine jiyankirin.

Ji destkeftiyên hene tê têgihîştin ku di dîrokê de cara yekem, bi dawîbûna serdema qeşayê ya çarem re şert û mercên avhewayê pir dijwar bûne. Di van şert û mercan de civaka neolîtîkê, li qontara çiyayên Zagros-Torosê dest pê kiriye.

Cara yekem, navê şoreşa neolîtîkê şûnwarnasê(arkeolojê) Îngilîz "**Gordon Childe**" di salên

1930'î de bi kar aniye. Şoreşa neolîtîkê, şoreşa çandinî û kedîkirina lawiran e.

Tevî ku şoreşa neolîtîkê; şoreşeke gundewariyê ye, di heman demê de jî; şoreşa jinê ye. Di vê serdemê de çandinî û lawirvanî li derdora jinê pêş dikevin.

Jina destpêkê, ya ku komkirina şînatiyan baş nas dikir, di vê serdemê de çandinî jî da destpêkirin. Ev her du rastî, ji hev ne cuda ne.

Ev serdem, serdema kedîkirina lawiran, çandiniya daran, avakirina gund û perestgehan e. Bi tevnê cil û berg, bi destaran ard, cer û çêkirina xwarinê û veşartin, kevir birîn û bi wan xanî çêkirin, ev hemû berhemên vê serdemê ne.

Hin Amûrên Neolîtîkê

Beşeke mezin a şînatî û lawirên ku hîn jî tên bikaranîn û xwedîkirin, ên vê serdemê ne. Ji kevirên ku hatine verotin û ji kevirên sifir çêkirina bivir, tevşo, nîr û tekelek jî, berhemên bingehîn ên vê serdemê ne.

Çanda neolîtîkê, li her devera ku çûye, bûye herêmî. Di vê pêvajoyê de her tiştê ku di jiyanê de ristê dilîze, pîroz tê dîtin. Weke; qût, çandinî û her tiştên ku ji lawiran tên bidestxistin.

Di vê şêwaza hilberînê ya civakî de têkiliyeke weke ya di navbera dayîk û zarokan de hatiye jiyankirin.

Civaka vê serdemê, bi hemû endamên xwe re lawir û şînatiyên xwezayê nas dike û ji wan sûdê werdigire.

Ya ku di hilberînê de pêk tê; rêgeza **“hemû; ji bo yek kesî, yek kes; ji bo hemûyan”** e. Bi awayê semyana taybet, nêzîkatî li berhemên ku hatine hilberandin, nayê kirin. Ji ber vê yekê, divê her tiştê di jiyanê de komînal bin.

Hemû berhemên ku hatine hilberandin, ên civakê ne. Ezmûnên di jiyanê de hatine bidestxistin, ji hemû endamên civakê re tên dayîn.

Di nêzîkbûna endamên civakê de tiştên weke; desthilatdarî û semyanî nayê hizirîn. Hemû civak, li derdora jiyana ku jinê ava kiriye, jiyan dike. Ya ku civakê diafirîne, fêr dibe û fêr dike; dayîk e. Ji dayîkê dûrketin, tê wateya ji civakbûnê dûrketin e. Dûrî civakê mayîn, tê wateya mirin an jî tunebûnê. Ji ber ku di hişmendiya mirovên wê serdemê de ji derveyî civakê jiyankirin tune ye. Di vê serdemê de hemû tiştên ku hatine komkirin û lawirên ku hatine nêçîrkirin, li hev tên parvekirin, ev ji aliyê kê ve hatine komkirin an jî nêçîrkirin, tu girîngiya wê tune ye. Tiştên ku hatine komkirin an jî nêçîrkirin, weke berhema keda giştî tê dîtin. Mirovên civaka xwezayî, bi çavê sûcekî mezin li danahevê dinêrin. Cejnên ku îro jî tên pîrozkirin, hîn di wê serdemê de weke bergiriyeke pêşî tên pîrozkirin.

Di mirovê vê serdemê de nirx, bê civak nayê hizirîn. Hêmana ku di wê serdemê de zêde pêş dikeve, bihêzbûna pergala sincî ya civakê ye. Her wiha, di vê serdemê de li gorî lêkolînan tê têgihîştin ku bîreweriya dahûranî û hestiyarî bi hev du xurtkirinê re tiştên berketî û hêja diafirînin. Ji ber vê yekê, çêkera mejî û giyana mirovê civaka xwezayî hîn jî nehatiye perçiqandin, nakokiyên çêkirî di jiyana wan de tune ne.

Di pêvajoya neolîtîkê de destpêka çêbûna çêkera zimên

Ta serdema neolîtîkê, di civaka klanê de hîn jî zimanekî pêşketî tune ye. Mirov dikare piranî behsa hêma (sembol) û dengan bike.

Çand û zimanê Aryen, çandinî û lawirvanî berhemên vê şoreşê ne. Hemû herêmên ku ev şoreş lê belav bûye, bi piranî bi zimanê ku ji vê kokê hatine afirandin, pê diaxivin.

Dema ku di pêvajoyeke dirêj de çanda li vê derê li erdnîgariyeke mezin belav bû, bi awayekî xwezayî her ku çû bi cih bû û dabeşî bi sedan zimanên cuda bû.

Zimanên weke; kurdî, farisî, belûcî, efxanî, hindî, elmanî û îngilîzî ji heman kokê tên.

Sê komên bingehîn ên zimên hene. Koma Aryenî a ku jê re Hind-Ewrûpî tê gotin. Koma Semîtîk (Koma zimanê Hamî-Samî jî tê gotin) a ku di bingehê de cîhana ereb digire nava xwe. Koma ku Rojhilat digire nava xwe ya Sînîk (Li cihên cuda, weke Ural-Altay jî tê gotin); Çîn, Japon, Kore û Tirkî digire nava xwe.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Koçer, bi kîjan çandê navdar in?**

2- **Şoreşa neolîtîkê, kengî û ji hêla kê ve cara yekem hatiye binavkirin?**

3- **Çend berhemên şoreşa neolîtîkê, binivîse.**

4- **Di klanê de rêgeza ku di hilberînê de pêk tê, çi ye?**

5- **Dema ku endamek klanê ji dayîkê dûr dikeve, tê çi wateyê?**

6- **Komên bingehîn ên zimên, diyar bike.**

WANE 4

ÇANDA JIN Û XWEDAWENDÊ

Çêkera civakî ya nû û rêxistinî, li derdora jinê pêş dikeve.

Jina ku zarokan tîne û xwedî dike, dibe weke xwedawendekê. Tevî ku bi baweriyên totemî hebûna xwe diparêzin, baweriya xwedawenda dayîk

a ku wan jî derbas dike, baweriya bingehîn a etnîsîteyê ye.

Baweriya xwedawend; civakê diparêze, xwedî dike, bi hîs dike û diyar dike. Ya ku hem afirînerên civakê, hem nifşê mirov didomîne, xwedîkirinê pêk tîne, hem jî mirovahiyê diparêze, **jin** e. Ji ber vê yekê, di vê bawariyê de hizra ku li derdora jinê çêdibe, li pêş e.

Di pêşengiya jinê de pêşketina çandiniyê û kedîkirina lawiran, ango derbasbûna jiyana niştîcihî ya gundewarî (şoreşa neolîtîk), dibe sedema pir bilez a pêşketina hizrê.

Di jiyanê de ya ku derdikeve pêş û pêdiviyên bingehîn pêşwazî dike; ax, çandina şînatiyan, darên fêkiyan û lawirên kedî yên ku ji wan sûd tê wergirtin.

Di vê serdemê de bala mirovan çûye li ser hebûnên ku derfetên jiyanê ji wan re pêşkêş dikin û heyînên ku bi xwe re pîrozbûnê hildigirin.

Civaka wê demê, ji bo naskirina wan kedeke mezin dide û wan heyînan pîroz dibîne û hêzeke xwedayî dide wan.

Ya ku herî zêde vî tiştî dike, **jin-dayîk** e. Ji ber vê yekê, jin bûye xwedawend. Tişta ku **jin-dayîk** aniye asta xwedawendiyê, hêza wê ya afirandina civakê ye.


Jin-Dayîk

Ji ber vê yekê, jiyan û mirovahî bêhtir, mêtiyê diyar dikin. Zilamtî, tê wateya şaristaniyê. Di şaristaniyê de zilamtî weke nirxê herî jor hatiye payedarkirin.

Mêbûn jî bi berdewamî xistine asta anîna zarokan û berhemdariya zayendî. Civakbûn, bi pîrozî û rêxistinî çêdibe û ya ku vê pêk tîne **jin** e.

Di pileya duyem de bûna zilam, bi rista wî ya ku di civakbûnê de lîstiye, têkildar e. Di nava hozê de jî diyarkera **jin-dayîk**, pêşeng û rêber e. Vê rewşê, ji aliyê rewanî ve bandora xwe bi awayê çanda xwedawendiyê nîşan daye.

Di bingeh de xwedawendî, ravekirina hemû taybetmendiyên jina ku şoreşa neolîtîkê pêk aniye. Sembolên destpêkê; ne bi awayê zilam, bi awayê jina xwedawend e. Peykerên ku di lêkolînên şûnwarnasiyê de derketine holê, vê rastiyê piştrast dikin. Di vê serdemê de li ser ziman bandora mêtiyê li pêş e. Navê xwedawendên destpêkê, bi stêrkan hatiye sembolkirin.

Taybetmendiyên çanda dayîka xwedawend

Di ola dayîka xwedawend a di vê serdemê de xweda ji mirov re dost û hilberînker e. Taybetmendiya bûyîna dayîka xwedawend a di nava mirov û civakê de nîşan dide ku çi qas wekhev û azadîxwaz in. Ev yek, di heman demê de nîşan dide ku di wê serdemê de çîn nebûn. Ji ber vê yekê, di nava taybetmendiyên çanda xwedawendiyê de çînbûn, hiyerarşî û rêvebirina dewletê tune ye.

Têkiliya dayîk û zarokan çawa be, têkiliya xwedawendan a bi civak û xwezayê re jî wisa ye. Dikare her tiştê di nava xwe de bide jiyankirin, bi her tiştî re bibe yek û sergihayî bike. Ji ber ku xwe dispêre ked û hilberînê, pêwîstî bi derew û dagirkeriyê nabîne. Ji ber vê yekê, taybetmendiyên aştîxwaz li pêş in. Ev hemû taybetmendî, taybetmendiyên demokratîk û komînal in. Bîreweriya hestiyarî ya herî zêde di jinê de ye, ev jî bûye sedem ku jin beriya zilam jiyanê bi kûrahîtir têbigihêje û bijî. Ev yek, tê wateya ku jin jiyanê bi awayekî zelal dibîne. Bi hezarê salan dayîka xwedewand serbilind maye û sedema wê jî ew e, rista ku jinê di jiyanê de lîstiye. Civakê bi xwe xwedawend serbilind kiriye.

Xwedawenda ku yekem car bi afirîneriya neolîtîkê bû sembol, Star e. Ev rastî, di lêkolînên şûnwarnasiyê yên sumernasan de hatiye vedîtin. Ji vê û pê de çanda Starê; bi Nînhûrsag, Îştar, Hepat, Astarte, Kîbele, Afrodît… berdewam kiriye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çima jin di klanê de weke xwedawend hatiye naskirin?**
2- **Sedema ku hizr bi lez pêşketiye çi ye?**
3- **Têkiliya xwedawendan a bi civak û xwezayê re çawa bû?**
4- **Rista ola dayîka xwedawend a ji bo mirov, çi ye?**
5- **Çima bi hezarê salan, dayîka xwedawend hatiye serbilindkirin?**
6- **Navê çend xwedawendan ên bi sembola star, binivîse.**

WANE 5

ÇANDA HOZ Û EŞÎRÊ

Hoz Û Eşîr

Hêmanên civakî yên herî girîng ku malbatan di nava xwe de bi cih dikirin û di civaka çandinî û gundewariyê yên ku bi heman çand û zimanî jiyan dikin de zêdetir pêş ketine, **hoz û eşîr** in. Hoz û eşîr, yekeyên ku ji bo hilberîn û parastinê, civak pêwîstî bi wan dibîne ye.

Dema ku klan û malbat di çareserkirina pirsgirêkên hilberîn û ewlekariyê de têrê nekirin, pêwîstî bi van hatiye dîtin, ku awayê rêxistinbûnê veguhere hoz û eşîrê.

Di rêxistinbûna awayê hozbûnê de tenê girêdana xwînê tune ye. Pêwîstiya hilberîn û ewlekariyê, vê şêwaza rêxistinbûnê neçar dike.

Hoz û eşîr, kevneşopî û diyardeyeke bi hezarê salan e.

Ji aliyê nûjeniya kapîtalîst ve şêwaza rêxistinbûna civakî ya hozê, weke paşverûtî û saziyeke ku pêwîst e bi lez bê derbaskirin, hatiye dîtin. Ev jî, qirkirina herî mezin a nûjeniya kapîtalîst e. Dema ku mirov di nava rêxistinbûna hozê de bimîne, ji pergalê re bi hêsanî nabe karker û keda wî/wê nayê xwarin.

Hebûna hozê; ji bo efendiyên koledar û feodal jî bi qasî ku axaftin jê re nebe, weke dijmin bû. Di dema hozan de hozan nikarîbû li ser endamên xwe koletiyê bisepînin.

Eşîr, awayê federasyona hozan e. Ji ber vê yekê, girîngiyeke zêdetir hilgirtine. Di rêjeyeke mezin de hebûna xwe li dijî êrîşên şaristaniya koledar parastine.

Çavkaniya bingehîn a çanda hoz û eşîrê; neteweyî ye û ji bo hilberînê jî kedeke mezin a wan ku dîrokî ye, çêbûye.

Çêkera civakî ya hevbeş a wan, hevkariyê dike bingeha her tiştî û giyana komînal bi hêz dike.

Dîroka şaristaniya demokratîk; di rêjeyeke mezin de dîroka biryardariya jiyana civaka sincî û polîtîk, azadî, demokrasî û wekheviyê ye. Ev jî; bi berxwedan û raperînê, li dijî êrîşên şaristaniya dewletê hatiye. Ya ku awayê bingehîn dide civakê; çêkara hoz û eşîran e.

Di serdema netewe dewletê de bi giranî ji aliyê komeke etnîkî ve hemû heyînên eşîrî, hoz û çandên wan tên tunekirin, ev bi serê xwe qirkirinek e. Ev nîjadkujiya mezin a li dijî civakê, her çiqas sist bûye jî, hê jî gef û xeteriya herî mezin e.

Di çêbûna neteweya demokratîk a ku li şûna netewe dewletê de were avakirin, hoz û eşîr dikarin weke çêkerên erênî risteke sereke bilîzin.

Îro jî hoz û eşîr, çêkerên ku dikarin di nava xwe de herî zêde jiyana komînal û demokratîk bidin domandin in. Bi taybetî, jiyana eşîrî bûye sedem ku dewlemendiya çandî derkeve holê. Lehengî, berhemeke çanda eşîrî ye. Paşverû dîtina hoz û eşîran, nexweşiyeke ku pergala desthilatdar belav kiriye. Hin eşîr û hoz ji ber pêşengên xwe, ev nexweşî wergirtine.



PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çima pêwîstiya klanê bi awayê rêxistinbûna hoz û eşîrê hebû?**

2- **Qirkirina herî mezin a nûjeniya kapîtalîst a li hemberî hoz û eşîrê çi ye?**

3- **Dîroka şaristaniya demokratîk, bi çi awayî êrîşî şaristaniya dewletî kiriye?**

4- **Bi riya çi; heyînên eşîrî, hoz û çandên wan hatine tunekirin?**

5- **Çawa hoz û eşîr, dikarin li dijî netewe dewletê, risteke erênî bilîzin?**

6- **Bandora sereke ya pergalên desthilatdar a li ser hoz û eşîran kiriye, çi ye?**

WANE 6

ÇANDA PARASTINÊ Û ÇÊBÛNA ETNÎSÎTE Û NASNAMEYÊ

Karê parastinê, tevî ku berhemeke ajoyî ye, domandina jiyanê ye.

Eger mirov çandê neafirîne, nikare jiyana xwe bidomîne. Ev tê wateya ku parastina herî baş, bi afirandina çandê ve gengaz dibe. Piştre jî bi parastin û pêşxistinê re jiyan berdewam dike. Awayekî din ê parastinê jî parastina fîzîkî ye. Di vê mijarê de jî awayekî parastinê yê ku ji dîroka klanan ta niha berdewam kiriye, heye. Li vir jî ya girîng, berxwedana kesên ku li gorî çanda komînal jiyan dikin, li dijî çanda desthilatdariyê dane birêvebirin e.

Berxwedan jî, çandeke parastinê ye û di gelek bermahiyên dîrokî yên weke; çîrok, destan, stran û hwd. de berhemên vê çandê hatine diyarkirin.

Di salên 15.000-10.000 B.Z. de çêbûna çanda çandinî û sazîbûna wê, çêbûna etnîsîte û nasnameyê dest pê kiriye. Ji vê demê û pê de jiyana niştecihî dest pê kiriye û civakbûn gihîştiye asteke bilind. Hozên ku yekîtiya ziman û çandê pêk anîne û di çêbûna vê serdemê de rist lîstine. Derbaskirina şêwaza etnîsîte û klanê, bi diyarbûna cudahiya nîjadan re pêş ketiye.

Veguherîna etnîsîteyê ya klanan, bûye sedema klanên ku li ser heman herêmê jiyan dikin; xwe bi rêxistin bikin û bi karê hevbeş rabin.

Hilberîna hevbeş û ziman her ku diçe, civakê bi hêztir bi hev ve girê dide. Êrîşên ji derve, vê rêxistinbûna civakî pêşdetir dibe.

Şêwaza hebûna etnîsîteyê, demokrasî ye. Awayê zêdetir hatiye pêşxistin, têgeha demokrasiya klanê ye.

Etnîsîte, pirsgirêkên navxweyî bi xwe çareser dike. Dibe weke encûmeneke xwezayî. Jin, zilam û kesên ku bê kêmasî ne, tevlî vê dibin. Encama ku ji vê tê girtin, bingeh e.

Etnîsîte, li dijî êrîşên ji derve, parastina rewa pêş dixe. Di rewşên bi vî awayî de ji xwe re pêşengekî leşkerî diyar dike. Ev pêşengê leşkerî, çi qas serkeftî be; dibe ku li ser erka xwe ew qas zêde bimîne.

Desthilatdariya ku saz bûye, ne herdemî ye. Ango rastiya herî pêşketî ku zanistên civakî îro xwe gihandiyê ya ku dibêje; **“bê dewlet, burokrasî nabe**” dide rizandin an jî xerabkirin.

Mirovahiyê ji % 98 jiyana xwe ya civakî; bê dewlet, bê burokrasî û bê desthilatdarî derbas kiriye.



Di etnîsîteyê de cudabûna nîjadî heye. Ev cudabûn, xwezaya pêşketinê ye. Jixwe pêşketin jî, bi cudabûnê re çêdibe. Nîjadên ku cuda dibin, bi avakirina yekîtiyeke asteke bilindtir re pêş dikevin. Ji ber vê yekê, li vir jî cudabûn û yekgirtin di nava hev de ne.

Di etnîsîteyê de desthilatdariyeke navendî nebû. Ji ber vê yekê, pêkhateyên weke federasyon û konfederasyon nêzîktirî pêkhateya etnîsîteyê ne.

Têkoşîna etnîsîteyan a li dijî dewletên weke Sumer û Asûr ên navendî, xwe bi awayê konfederasyonê ava kirine. Di berxwedanên etnîsîteyên Aryenî de ev li pêş e.

Etnîsîte; weke şêwaza rêxistinbûnê, hiyerarşiyê derbas nake. Pêvajoya hiyerarşiya erênî, pêvajoya lûtkeya etnîsîteyê ye.

Civaka bajarvaniyê

Etnîsîteyên hene; yan bi awayekî konfederal xwe birêxistin dikin û bi formeke nû hebûna xwe berdewam dikin, an jî sînorên hiyerarşiyê derbas dikin. Dema ku girêdanên têkiliya bi nîjadê re ji holê rabûn, hebûna etnîsîteyê lewaz dibe. Bi bajarbûnê ve girêdayî; çînayetî pêş dikeve û vediguhere dewleteke bi şêwaza Sumeran.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Karê parastinê yê di civakê de diyar bike.**
2- **Berxwedan çandeke parastinê ye, di kîjan bermahiyên dîrokî de hatiye diyarkirin?**
3- **Çêbûna etnîsîte û nasnameyê, kengî dest pê kiriye û bi xwe re çi encam aniye?**
4- **Şêwaza hebûna etnîsîteyê çawa ye?**
5- **Rista etnîsîteyê ya di civakê de diyar bike?**
6- **Çima pêkhateyên weke federasyon û konfederasyon, nêzîkî pêkhateya etnîsîteyê ne?**
7- **Dema ku girêdanên têkiliya bi nîjadê re ji holê radibin, bandoreke çawa li ser hebûna etnîsîteyê dike?**

WANE 7

ÇANDA ŞAMAN Û RAHÎBAN

Şaman: Di civakbûnê de kevneşopiya şamanîzmê, qonaxeke civakî ya giştî ye. Şaman; kesên ku beriya rahîb, şêx û zanayan ên ku ji civakê re rêbertî dikirin.

Çînayetiya Sumeran

Şaman, peyveke moxolî ye û tê wateya; anîna giyanên baş ji bo alîkariya mirovan a li dijberî nexweşî, birçîbûn û karesatên xwezayî.

Di pêvajoyên destpêka hinek civak û hozan de weke pêkanîneke ku bi pîresêrî re têkildar e, ku dixwestin ciwanan li gorî bawerî û kevneşopiyan bikin yek û wan li gorî pergala ku heye bi rêk û pêk bikin.

Şaman; ji ber zanabûn û ezmûnên xwe, pêşengê civakê ye. Ew, weke bîra dîrokê, erk digire ser milên xwe û di heman demê de berdewamiya zagonan diparêze.

Şaman, divê ku mirovekî zilam be, hevgirtinekê bi zilamê rîspî(kal) xwedî ezmûn û serwerê leşkerî re çêbike. Ev, dibe weke hevalbendiyekê ku modêla yekem a hiyerarşiyê ava bibe.

Rahîb: Rahîb bi xwe, ji çanda şamanan tê. Rahîb, karsazê yekem û destpêkê ye. Li gorî serdema xwe; kapîtalîst an jî axa ye. Karê wî yê dîrokî ku pêwîst bike heye. Di

destpêkê de mirov dikare bêje; avakerê bajar ê ku mohra xwe li avakirina civaka nû daye, rahîb e.

Li derdora wî; ne gundek, wê bajarek were avakirin. Ger em roja xwe ya îro jî bînin ber çavên xwe, pir mezinbûna erkên rahîb baştir tê têgihîştin.

Bajarê ku were avakirin, pir kedê dixwaze. Ji bo vê jî, pêwîstî bi gelek karkeran heye. Ev karker, wê ji ku derê bên peydakirin?

Tê zanîn ku ji klan û etnîsîteyê qutkirina mirov pir zor e. Ji ber ku di dema wan de weke îro, bêkarî bisazî nebûye. Kesên kit û mit ên ku ji civakê qut dibin, têrê nakin. Derbasbûna serdema bi zorê û kolekirina mirovan, hê pêk nehatiye.



Ji ber vê yekê, dibêtiyeke pir mezin e ku rahîb, xwedawend weke çekekê bi kar aniye. Ew, ji bo vî karî pir jêhatî ye ku yek dikeve vê erkê (avakirina xwedayan).

Eger di vê erkê de bi ser nekeve; wê nikaribe bajar û civaka nû, her wiha hilberîna zêde pêk bîne. Ev mînak, pir aşkere diyar dike ku çima rêveberên yekem ên dewletê hemû rahîb in.

Zigûrat, ne tenê guh dide bajar, xweda, hilberîna zêde û civaka nû. Di heman demê de guh dide hemû cîhana têgehan ên weke; pîresêr, zanist, huner û malbat, ta plansaziya

danûstandina destpêkê ji nû ve çêdike, projeyên wê jî derdixe û ava dike.

Di civaka dewletî de rahîb endezyarê yekem e, avahîsazê destpêkê ye, pêşnûmeya yekem a pêxemberiyê ye, aborînas, jimaryar, çawîş û qralê yekem e.

Rahîban, karê rêvebirinê di asteke bilind de bi rewabûnê ve pêk tanî. Ji ber ku di vê mijarê de hunera wan a herî mezin; berdevkiya xwedayan kirin û yekdestiya ku li ser zanistê avakirin bû. Nûnertiya xwedayan û vedîtinên zanistê, hêzeke mezin a rêvebirinê pêşkêşî wan kiriye.

Em ji bîr nekin ku ta di kapîtalîzma îro de jî, zanist weke hêzeke mezin tê bikaranîn. Li ser bingeha zanistê ya rast a di civaka neolîtîkê de bi taybetî, di serdema Til Xelef (6000-4000 B.Z.) de li ser çanda ku jinê afirandibû, pergaleke nû tê pêşxistin.

Gelek vedîtin, ji aliyê jinên dayîk ve hatine kirin. Weke; avakirina xaniyan, kedîkirina lawiran, komkirina şînatiyan, çêkirina amûrên aş û tevnê û hwd. Lê belê, rêveberê zilam ev vedîtin ji wan dizîne.

Şaristanî, hinekî jî li ser van bingehên zanistî yên ku di serdema neolîtîkê de hatibûn afirandin, hatiye avakirin.

Rahîban, bi riya vedîtinên ku kirine, li ser nirxên şaristaniyê bi piranî ji aliyê erênî ve bandor kirine. Bi taybetî, di bingehên zanist û şaristaniya îro de vedîtinên weke; nivîs, stêrnasî(astronomî), bîrkarî, bijîşkî û hwd. ji aliyê rahîban ve hatine kirin. Hunera herî mezin a rahîban; ji xwedayan re berdevkî kirin û li ser zanistê avakirina desthilatiya xwe ye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Rista şaman a di pêvajoyên destpêka hin civak û hozan de diyar bike.**
2- **Karê rahîb ê dîrokî di destpêkê de ku pêwîst dike, çi ye?**
3- **Çawa bajar, bi riya rahîban hatiye avakirin?**
4- **Armanca sereke ya avakirina zigûratan, binivîse.**
5- **Taybetmendiyên rahîban ên di civaka dewletî de diyar bike.**
6- **Çend vedîtinên zanistî yên ku ji aliyê jina dayîk ve hatine vedîtin û rêveberê zilam ji wan dizîne, diyar bike.**
7- **Vedîtinên ku rahîban li ser nirxên şaristaniyê kirine, diyar bike.**

WANE 8

DERBASBÛNA SERDEMA HIYERARŞÎYÊ

Dîroka civakî, pêvajoyeke pir demdirêj e. Hin qonaxên wê, li ser jiyana mirov bi kûrahî bandor kirine. Ev pêvajo, bi têgeha "**hiyerarşiyê**" ve hatiye pênasekirin.

Hiyerarşî, awayê xwebirêxistinkirina rahîban e, ango tê wateya rêveberiya pîroz.

Ji bo ku kar û barên civaka ku mezin dibe; bi awayekî rêkûpêk û bi pergal werin birêvebirin, awayê rêxistinbûnê yê ji jor, ber bi jêr ve ye, ango '**tîk**' e.

Peyva '**tîk**' girîng e. Êdî ji vir û pê de bingeha şaristaniyê, wê li ser çêkera '**tîk**' pêş bikeve.



Em ji komeke biçûk bigirin, ta pergaleke herî mezin (weke dewletê), wê hebûna xwe li ser çêkereke tîk û pergala fermanan pêş bixe û pêk bîne.

Di pergala hiyerarşiyê de ji jor, ber bi jêr ve ferman tê dayîn û ji jêr, ber bi jor ve jî, ev ferman tên bicihanîn.

Ev fermanên pîroz, hemû jiyanê bi rêxistin û çavdêrî dikin.

Ev, destpêka serdema ku desthilatdarî vediguhere hêza rêxistinkirî û têkiliyên civakî diyar dike.

Lê belê, bi demê re hiyerarşî di hemû qadên jiyana me ya civakî û kêliyên wê de bi cih bûye.

Di malê de serokê herî biçûk "zilamê ku bav e", dikare dayîka ku "jin e" jî bibe serok.

Lê belê, bi misogerî divê serokek ji malê re hebe. Ger bav nebe, birayê mezin; ango bi misogerî wê zilamek be. Lê belê, ger zilamek nebe, an jî bê bandor be; ji neçarî jina ku li malê û derve, axaftina wê derbasdar û kêrhatî ye; dibe seroka malê.

Serokê malbatê, di ser her tiştî re ye. Beşeke karan bi xwe pêk tîne, yên ku destdayî dibîne (bi piranî bi kurê xwe yê mezin) dide kirin. Hin karên xwe, bi hevjîna xwe jî dide kirin.

Bi kurtasî, bi her kesê ku di nava malê de ye, karekî pê dide kirin. Çi kar û xebat dibe bila bibe, bêyî ku bi serokê malê re şêwirîn û erêkirina wî neyê standin, nayê kirin. Ji ber ku ferman bingeh e.

Têkiliyên malbata bi xizmên zilam ên weke; bira û apên wî re berfirehtir dibin. Nirxên weke; nav, navê bav û kalan, mal û semyan, ev nirxê zilam in ku cih digirin.

Ev, çêkera hiyerarşiyê ya di nava malbatê de ye. Sedem ew e ku em ji bo vê mijarê, malbatê mînak didin. Malbat, xwedî dîrokeke pir demdirêj a civakî û diyardeyeke xwedî taybetmendiya domdar e.

Ji bo ku karên ku hene, bi awayekî rêkûpêk û di bin çavdêriya wan de bi rê ve bibe, di yekeyeke herî biçûk de jî, çêkera hiyerarşiyê xwe bi cih kiriye.

Li mal, dibistan, kargeh û bazarê, di navbera pîr û ciwan, jin û zilam, serdest û bindestan û hwd. de di her qada civakê de jî, rêkûpêkiyeke hiyerarşiyê heye û serdest e.

Çanda hiyerarşiyê ya tîk, çavkaniya xwe; ji "**yek**" kesî digire. Hatiye rewşeke wisa ku mirov nikare civak an jî,

komeke bêhiyerarşî bihizire. Bingeh û kêliyeke ku tê de hiyerarşî tune ye, nabe. Ango hiyerarşî, valahiyê nas nake. Li cihê ku valahî çêdibe, astengî pêk tê.



Ji civaka xwezayî ta çêkera civaka îro, hiyerarşî her tim mezin bûye û pêş ketiye. Lê belê, hiyerarşiya ku di civaka xwezayî de heye û hiyerarşiya ku di civaka dewletî de heye; ji hev pir cuda ne.

Hiyerarşiya ku li derdora jin-dayîkê pêş dikeve û bi demê re gelek beşên hiyerarşiyê digire nava xwe; hiyerarşiyeke bisûd e û ji her kesî re ye. Ji ber ku dema pêdivî bên pêşwazîkirin û berjewendiyên civakê li berçavan bên girtin, tê bikaranîn. Ne birêxistinkirî û bisazîbûyî ye. Ji ber ked û xizmeta ku dike û nirxên ku diafirîne, jê re rêz tê girtin. Ji ber ku di navbera serok û civaka ku heye de têkiliyeke weke; ferman, şîret, efendî û hwd. tune ye.

Di civaka xwezayî de tenê ji bo ku kar bê birêvebirin, hiyerarşî tê bikaranîn û serokê civakê bi darê zorê tiştekî bi kesî nedida kirin.

Civak, ji bo ku karê wê baştir were birêvebirin, ji xwe re rêberek hildibijart. Rêber jî, tenê dema ku pêwîstî pê dihat dîtin, tiştê ku pêwîst bû bihata kirin, bi awayê danezanan radigihand civakê.

Lê hiyerarşiya ku bi zilam re dest pê kir, xwe gihand sazîbûna dewletê, xwe spart darê zorê û çavkaniya xwe tenê ji kedxwarî û dagirkeriyê girt, qonaxeke nû di navbera jina dayîk û zilam de dest pê kir ku pergala sincî û polîtîk a civakê hat xerabkirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Awayê hiyerarşiyê, ji ku derê hatiye?**
2- **Çawa hiyerarşî di malbatekê de tê birêvebirin?**
3- **Bingeha şaristaniyê, li ser kîjan çêkerê hatiye pêşxistin?**
4- **Çanda hiyerarşiyê ya tîk, çavkaniya xwe ji ku digire?**
5- **Çima di civaka xwezayî de hiyerarşî dihat pêkanîn?**
6- **Kengî pergala sincî û polîtîk a civakê, hatiye xerabkirin?**
7- **Li ku dera civakê, rêkûpêkiyeke hiyerarşiyê serdest e?**
8- **Çima hiyerarşiya ku li derdora jin dayîkê pêş dikeve, ne birêxistinkirî û bisazîbûyî ye?**

WANE 9

DERBASBÛNA CIVAKA HIYERARŞIYÊ

Bi hiyerarşiyê re civak ji nû ve tê avakirin. Ev avabûna nû, hewl dide ku weke bandoreke pêkhatî li ser çanda têkiliyên civaka rabirdû û awayên jiyanê xwe bi rêxistin bike. Ji ber ku jina di zîgûratên sumeran de xwedawend bû, di perestgehên wan de weke jineke bê rûmet û bê sinc derdikeve. Ango bi navê civaka xwezayî (jin) çi hebe, li dijî wê, awayekî civaka nû (zilam), pergaleke bi desthilatdariya çînî pêş xistiye.

Berhema zêde: Zêdebûna mal, samanên ku tên hilberandin û amûrên hilberînê yên ku pêş dikevin, dibin sedem ku di hilberînê de teqandineke mezin çêbe. Beriya vê, ji bo zêdebûna berheman (zêdebûna pêdiviyan) ku neyê veşartin û nekeve bin kontrola hêzekê, hewl dihat dayîn ku bihatana belavkirin. Bi demê re ji bo ku zêdebûna berheman bi teşeyên cuda bên nirxandin, li şûna têgeha belavkirinê; veşartin û danahev pêş diket.

Ji bo ku berhema zêde were kirin, pêdivî bi hin erkên (fonksiyon) girîng heye. Li gel vê, ji aliyê ristên civakî ve guhertinên girîng derketine holê.

Hiyerarşiya ku zilam jê re pêşengiyê dike, nakokî û desthilatdariya zayendî derxistiye holê.

Her wiha, wê serdestiya mirov a li ser xwezayê, serdestiya rîspiyan(kal) a li ser ciwanan, serdestiya zilam a li ser jinê û serdestiya çînekê ya li ser çînên din dest pê bike.

Çanda hiyerarşiyê; zayendperest, çînperest û etnîsîteperest e. Ango bêyî ku zayendperestî, cudahiya çînayetî bide pêş, nikare pergala xwe ava bike.

Pirsgirêkeke çanda hiyerarşiyê ya weke hizirîna hevbeş, tevlîbûna hilberîna hevbeş û jiyana hevbeş, tune ye.

Di hiyerarşiyê de birçîbûna mirovan, di şert û mercên pir zehmet û giran de jiyankirina wan û stemkariya mirovan, weke çarenûsekê ku xweda daye wan, bi awayekî rewa dibînin û divê her kes bi çarenûsa xwe qayîl be.

Mirovên di wê serdemê de dijîn, dema ku bi van hemûyan re rû bi rû diman, bawer dikirin ku ji bo başî û kêfxweşiya wan wiha ye. Ji ber vê yekê, serdestên ku di vê serdemê de dijîn, pêwîst nabînin ku xwe di lêpirsîna wijdanî re derbas bikin.

Têgehên weke; yekîtî, hevkarî, alîkarî û tevgerîna bi hev re, ji aliyê hiyerarşiya desthilatdar ve her tim weke rêbaz tên bikaranîn. Lê, van li ser bingeha xizmeta pergala hiyerarşiyê bi kar tîne.

Her ku pergala hiyerarşiyê pêş diket, derbasbûna pergala dewletê pêk dihat.

Pergala dewletê jî; bi hiyerarşiya zayendî, çînayetî û etnîkî ve xwe bi rêxistin dike û çanda dagirkeriyê derdixe holê. Hemû kar û xebatên ku di çarçoveya kedxwariyê de pêş dikevin, bi sincê dagirkeriyê ve derdikevin holê.

Mirovên desthilatdar ên ku baweriya xwe bi nêrîna (ji bo ku karibin jiyan bikin, pêwîst e ji sedî sed xwezayê bigirin bin kontrola xwe) anine, weke derketina xwe ya duyem di nava civakê de dikeve nava hewldana parçekirina civakê.

Vê yekê, civak beş bi beş kiriye û çanda cûdabûnê (jin, çînayetî û etnîsîte) ya bingehîn amade kiriye.

Çanda zilam; çanda çînayetî ye, çanda çînayetî jî; çanda etnîkî ya ku bi serdestiyê mezin dibe ye. Çanda serdestiyê ya

ku xwe dispêre dagirkerî û cudahiyê; li gorî nêzîkbûna xwe, rêgezên sincî pêk anîne.

Ji bo ku çalakiyên bi vê şêwazê werin kirin, xebatên bîrdoziyê tên lidarxistin, eger ew jî têrê nekin, bikaranîna tundiyê, weke mafekî dibînin. Dibêjin: ‘Em van hemûyan ji bo başiya mirov, civak, ewlehî û xweşiya civakî pêk tînin’. Dibêjin; pêwîstiya civakê bi yekîtiyê, bihevrebûnê û pergaleke ku were pejirandin heye. Ev jî, dikare tenê çîneke jorîn û kesek ji çîna jor pêk bîne. Her tim hewl didin ku kar û xebatên xwe bi argumanên bîrdozî, bi civakê bidin bawerkirin û ji dagirkeriyê re vekin.

Rahîbên destpêkê

Rahîbên destpêkê; ferman û daxwaziya destpêkê, ji bo ku çanda desthilatdariyê li ser civakê were belavkirin, bi kar anîne. Li ser sincê civakî, berhemên xwe yên sincî belav dike, her wiha sincê civakê xerab dike.

Cudahiyên bi her awayî; weke awayê dagirkerî û tundiyê, çanda civaka şaristanî û hiyerarşiyê ne.

Bi rêbaz û amûrên cur bi cur, sincê serdest; weke exleqê herî baş nîşan dide. Ev, hewldana xapandina civakê ye.

Hiyerarşiyê, xwe li pişt civaka sincî veşartiye. Hewl daye ku pergala xwe pêş bixe û nêzîkbûnên weke; li ser jinê û mirovan cudahiya çînayetî û etnîkî weke zagonên xwedayan, an jî weke zagonên xwezayî werin sepandin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Jina ku di zîgûratên sumeran de xwedawend bû, di perestgehên wan de çawa dihat çawa bû?**
2- **Sedema ku di hilberînê de teqandineke mezin çêdibe, çi ye?**
3- **Ji bo zêdebûna berheman, bi demê re kîjan têgeh li şûna belavkirinê dihat pêkanîn?**
4- **Dema ku zilam pêşengiya hiyerarşiyê dike, çi encam derdikeve holê?**
5- **Çanda hiyerarşiyê, li ser kîjan pergalê xwe ava dike?**
6- **Pergala dewletê, çawa xwe bi rêxistin dike û çi encaman derdixe holê?**
7- **Rahîbên destpêkê, risteke çawa li ser sincê civakê lîstine?**
8- **Hiyerarşiya ku xwe li pişt civaka sincî veşartiye, çi hewldan kiriye?**

WANE 10

ÇANDA ZÎGÛRATÊ

Zîgûrat (cihê rêveberî û perestinê), ne tenê cihê perestin û perwerdeyê ye. Cihê akademî û afirandina gelek rêbazan, di heman demê de jî navendên hilberînê bûn. Ango di van perestgehan de ji civaka ku dihat avakirin, li aliyekî hêzgirtina zanist û hunerê, li aliyekî jî hişmendiya ku xwe dispêre bingeha bîrdoziyê, dihat avakirin.

Zîgûrat

Li aliyê din jî; çandinî, pîşesazî, lawirvanî û bazirganî dihatin pêşxistin. Di encamê de jî, rewşa jiyanê xweştir û hêsantir dibû.

Li perestgehan, ne tenê perwerde û hilberîn dihatin kirin, di encama van hemû karan de li ser hişmendiya ku wê civak ji vir û pê de çawa jiyan bike, bi mirovan didan têgihandin.

Di zîgûratan de sê erkên sereke hene:

Erka yekem: Kesên ku li ser axê kar dikin û di qata herî jêr de dihatin dîtin, ku samanê zîgûratan bûn. Yên ku amûr û pergal jî çêdikirin, ew jî li wir dijîn.

Erka duyem: Erka rêveberiyê ye, ku ji aliyê rahîbên li qata duyem rûdiniştin, tê pêkanîn.

Erka rahîb, ew e ku divê hesabê karên mezin bigire, ji bo ku xebatkar bi awayekî hevbeş bixebitin, pêwîst e rêveberiyê bikin. Ango, divê hem karê cîhanê, hem jî karê olî pêk bînin.

Erka sêyem: Ji aliyê panteonê ve dihat birêvebirin. Zîgûrat, di bandorkirina rewanî de weke modeleke civakên şaristaniyê yên ku piştre bên avakirin e.

Ev, saziyeke ew qas bêhempa ye ku modela bingehîn a bajarên ku hejmara wan îro bi sed hezaran, an jî milyonan derbas dike. Zîgûrat di serdema xwe de jî; ne tenê navenda bajar e, lê ew bajar bi xwe ye.

Erka herî girîng a sêyem jî, ew bû ku qral-xweda li qata herî jor dimîne. Kes nêzîkî wir nedibû. Cihê herî pîroz e. Panteona xwedayan e. Tenê şaman û rahîbê herî mezin dikarin bi qata jor re peywendiyan çêkin. Ev çêkera zîgûratan, li gorî çêkera hiyerarşiya ku di nava civakê de hatiye avakirin, mînaka herî berbiçav e.

Di zîgûratan de nêzîkbûna li jinê dihat kirin, di hin zîgûratan de jin ji aliyê zayendî ve weke amûrekê dihat bikaranîn. Ev yek, weke çandekê lê hatibû, keçên herî bedew ên malbatên bi nav û deng dihatin girtin. Di pêvajoyeke perwerdeyê ya hunerî re dihatin derbaskirin. Jinên ku di encamê de li vir dihatin perwerdekirin, ji bo zilamên herêmê yên herî navdar dihatin pêşkêşkirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Armanca avakirina zîgûratan, çi ye?**

2- **Erka yekem a di zîgûratê de diyar bike.**

3- **Erka rahîb a di zîgûratê de diyar bike.**

4- **Panteona xwedayan, di kîjan qata zîgûratan de ye?**

5- **Bi qata herî jor a zîgûratê re kê dikarîbû pêwendiyan çêke?**

6- **Çawa di zîgûratan de nêzîkbûn li jinê dihat kirin?**

WANE 11

ÇAND Û SINCÊ BAJÊR

Bajar, bandoreke li dijî jiyana gundewarî û çiyayî pêş xistiye. Jiyana gundewarî û çiyayî, zêdetir bi awayê komikên biçûk ên ku jê re **gund** dihat gotin e.

Gundê Hemzebegê

Ev komikên ku bi awayekî xweser li çiya, dol û deştan jiyan dikin, weke gundên Kurdistanê yên îro ne.

Bajar jî, herêmên kar û hilberînê ne. Li bajaran keda mirovan, ji aliyê mirovan ve tên xwarin. Berhema ku zêde tê komkirin, hemû hêmanên weke; hiyerarşî, çînayetî, dagirkerî û desthilatdariyê, ango şert û mercên çanda heyberî ya desthilatdariyê li bajaran tên bidestxistin û pêşxistin.

Bajarê Qamişlo

Pirsgirêka bajarbûnê ya civakê

Di erebî de navê şaristaniyê; medeniyet e, ango tê wateya bajarbûnê(bajarvaniyê).

Pirsgirêkên ku çavkaniyên xwe ji bajarbûnê digirin, girîngiya wan a ji pirsgirêkên jîngehê(ekolojîk), ne kêmtir e.

Di roja me de ji bo jiyana civakî ev pirsgirêk bûne gefeke (tehdîdeke) bingehîn.

Çima bajar hatiye vê rewşê?

Mirov dikare ji bo ku bi têgeheke seresere were têgihîştin, bendekeyeke hêsan a bi vî awayî derxe; **Bajar=çîn=dewlet**. Lê ev bendeke, kûrbûna wateyê û piralîbûna wê, li ber çavan nagire. Mirovahî, bi qasî ku avakirina gundan li gorî xwezaya mirovan hizirîne, avakirina bajar jî, li gorî xwezaya mirov hizirîne û pêk anîne.

Em dikarin bajêr, ji du aliyan ve bigirin dest:

1- Aliyên bajarvaniyê yên baş

Bajar, cihên sereke yên ku li wir jîrbûna civakî li ser hev kom bûye.

Bajar, kêrhatina jîrbûna mirovan bi coş dike, derdixe holê û li bajaran mirov ji bo her tiştî hêza xwe dibîne.

Bajar, şert û mercên biewle pêşkêş dike. Mirovên ku di şert û mercên biewle de ji xwe bawer dikin, bi hişmendî dihizirin. Hizir jî, pêşiya vedîtinên nû vedike.

Bajar, rêbaz û teknîkên pirbûna berheman pêş dixe. Mirovên ku vê bi kar tînin û encaman digirin, her tim bajar weke ronahiyekê dîtine û hewl dane ku xwe bigihînin wir.

Civak, li bajêr hiş û nasnameya xwe vedîtiye û ava dike.

Her ku hin pirsgirêkên bajêr hebin jî (dagirkerî û bi rêxistinbûna yên xwedî hêzê), eşkere ye ku di pêşketina hişmendî de bajar gaveke şoreşgerî ye.

Arîsto, ji bo mezinahiya bajaran, hejmara şêniya herî guncav, weke 5 hezarî dihizire. Dibêje; bajarekî ku ji 5 hezarî derbas bibe, ew nabe bajar. Piraniya bajarên serdema avabûnê jî, şêniyên bi vê hejmarê bûn.


Arîsto

Li bajaran civakeke nû çêbûye. Civaka hozê hatiye derbaskirin.

Ên ku ji hoz û nîjadên cuda tên, bi girêdaneke ku jê re hemwelatiya bajêr tê gotin û bi hev re hatine girêdan, "gelê bajêr", "hemşerî" û "bajarî" çêdibin.

2- Aliyên bajarvaniyê yên nebaş

Bi pêşketina çînayetî û dewletbûnê re aliyê bi pirsgirêk ê bajêr derketiye holê. Sedema wê, bingeha heyberî ya çînbûnê ku berhemdarî pir dibe ye.

Hin ji aqilmendên bajêr ên ku pêş dikevin, bi ezmûnên xwe fêr bûne ku hêjmara mirovan zêde bikin û li ser axên berhemdar bidin xebitandin, dikarin hejmareke zêde mirov têr bikin. A ku ji vê şûn de dimîne; avakirina pergal, an jî pergala dewleta ku bi cureyeke yekalî pêk were.

Ev rêxistina nû ya pergalê, eşkere ye ku weke yekdestiya çandiniyê ava bûye. Ya rast, diyardeya ku jê re dewlet tê gotin a ku bi hilberîna zêde debara xwe dike ye.

Bajar jî, cihekî ku ji vê re destdayî ye. Mirovahî, li bajêr bi diyardeya kedxweriyê re rû bi rû maye, awayê têkiliyên ku nas nake, dîtiye.

Bajar, sedemeke mezinbûna civakê ye. Lê belê, çînbûn û desthilatdariyê xurt dike. Ji ber ku komên dijberî hev, her tim li bajaran dijîn, wê pevçûnên herî dijwar jî li navenda bajaran pêş bikevin.

Têgehên weke; ezezî û samanperestî li bajaran pêş dikevin û hewl tê dayîn ku weke çandekê hemû civak li gorî vê were birêkûpêkirin.

Di şert û mercên herî xerab de mirov tên xebitandin, bi armanca ku ewlehî tê girtin, tundiya herî mezin tê pêkanîn, civak her tim bi tirsê re rû bi rû tê hiştin. Merdî, duristbûn,

comerdî li bajaran xerab dibin. Her ku diçe, çanda jiyana bi hev re û hezkirina ji xwezayê re ji holê radibin. Her tim derûniyeke bi tirs pêş dikeve.

Moral, weke ba û tozê demdemî ye. Derew, çavnebarî û xapandin di sincê bajêr de herî zêde tên jiyîn. Ji ber ku bi taybetî, li bajaran pere weke armanceke sereke tê dîtin, kar û xebatên hevpar ên weke alîkariya hev, hevkarî û hwd. hema bêje tune ne.

Mirovên ku bi darê zorê, berjewendiyên daringî anîne gel hev hene. Ew jî pirî caran di mirovên heman nîjadî de pêk tê.

Çanda bajêr, ristekê li dijî mirovahiyê dilîze. Pirsgirêk ne avabûna bajaran e, lê veguhertina hişmendiyê ye.

Êdî weke pir pesnê wê tê dayîn, bajarên bi milyonan şênî dihewînin, nikarin mirovan xwedî bikin. Hema hema hemû bajar hatine rewşa çavkaniya nexweşiyan. Ji ber vê yekê, êdî li bajaran gotina çandeke demokratîk û azad, her wiha hişmendiyeke sincî, ji mirovan pir dûr e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Li bajaran li ser keda mirov, bandoreke çawa çêdibe?**
2- **Pirsgirêkên ku çavkaniyên xwe ji bajarbûnê digirin, li ser jiyana civakî bandoreke çawa dikin?**
3- **Çend aliyên baş ên bajarvaniyê, diyar bike.**
4- **Arîsto, ji bo mezinbûna bajaran, hejmara şêniya herî guncav dibîne, çi qas e?**
5- **Sedema derketina pirsgirêkan a li bajêr çi ye?**
6- **Çend aliyên nebaş ên bajarvaniyê, diyar bike.**
7- **Çend têgehên ku li bajêr sincê civakê xerab dikin, binivîse.**

WANE 12

ÇANDA BAJARÊN KEVNAR

Di seranserî serdema kevnar de ji derveyî Babîl û Romayê, pirsgirêka şêniyê ya bajaran tune ye.

Bi serekebûn, bi hin sûdên xwe yên civakî ve hêza xwe ya kişandinê her tim pêş dixe.

Bajarê Romayê

Di vê serdemê de di kesayetiya bajarê Misirê de bajarên ku nîv bajar û nîv gund in, di dîrokê de bêhempa ne. Ev bajar, xwe dispêrin bazirganî û pîşesaziyê, her wiha pir pêş dikevin. Di vê serdemê de li derdora perestgehan, avaniya nû ya bajêr pêş dikeve. Di van bajaran de mînakên balkêş ên weke; rê, mîmarî, spor, huner û qesran tên pêşxistin.

Piraniya bajaran, li derdora garnîzonên leşkerî, tên avakirin. Bi taybetî, bajarê Romayê di heman demê de garnîzona leşkerî ye. Her wiha, taybetmendiyeke balkêş a vê serdemê, avakirina têkiliyeke sîmboyotîk (bi awayê beramber bi hev girêdayî û hev xurtkirin) a bi gundan re ye. Ango, di navbera gund û bajaran de nakokiyeke ku bibe pirsgirêk hîn pêş neketiye, piranî berjewendiyeke dualî ya gund û bajaran heye.

Garnîzoneke Leşkerî Ya Roma

Romaya ku bajarê herî dawî yê serdema kevnar bû, dibe ku hemû pirsgirêkên serdemê di nava xwe de hildigirtin. Vê jî, yeko-yeko wisa lê kiriye ku Roma hem bûye bajarê herî bihêz, hem jî bûye bajarê herî bipirsgirêk ê şaristaniyê. Li Romayê hemû çînên weke; bûrjuwa, kole, proleterên lumpen, bi her awayî nîjad û komên etnîk û baweriyan hebûn.



Parlemana Romayê

Li aliyê din jî, dîtina her awayê sinc, polîtîka û rêvebirinê jî, gengaz bû. Qraltî, cumhuriyet û hemû mînakên demokrasiyan çêbûne. Dikarîbû mînakên yekem, an jî bermahiyên zanist, huner, felsefe û hemû olan bihatana dîtin. Bi rastî jî, Roma bajarekî aboriyê bû. Gotina; “**hemû rê derdikevin Romayê**” vê rastiyê tîne ziman.

Bajar, di serdema navîn de: Pêvajoya ku weke serdema navîn tê binavkirin, nikarîbû tu demê xwe bigihîne bajarbûna serdema kevnar. Bi kelh, sûr û bajarên xwe ve serdema navîn bi awayekî qels û pir biçûk dest pê kir. Bajarên serdema navîn, bi awayekî biryargeha derebegî û mîrîtiyan bûn. Li derdora van bajaran, ji ber ku pîşekar û xizmetkarên qesran kom dibûn û jiyan dikirin, potansiyela firehbûnê hildigirtin.

Her çi qas çîna bazirganan, ji bo mezinbûnê leza destpêkê bide jî, bajarên; Îskenderiyê, Antakya, Nisêbîn û Riha-Edesa, weke Romayê pêş neketin.

Bajarê Rihayê

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Bajarên Misirê di serdema kevnar(entîk) de çawa dihat xuyakirin û xwe dispartin çi karî da ku pêş bikevin?**

2- **Bajêrên di serdema kevnar de di kîjan warî de balkêş bûn?**

3- **Bajarê Romayê bi taybetî, li ku derê hat avakirin?**

4- **Çend çînên etnîkî yên ku li Romayê hene, binivîse.**

5- **Çima Roma bajarekî aboriyê bû?**

6- **Bajarên serdema navîn, bi çi awayî tên dîtin?**

WANE 13

ÇANDA BAJARAN A DI NÛJENIYÊ DE

Qeyrana bajarbûnê, ya rastî; weke berhema şoreşa pîşesaziyê di sedsala 19'an de derdikeve holê. Ev, ne pîşesaziyeke, bi rastiya pîşesaziyê re ya ku li dijî civakê ye, têkildar e.

Aliyê bajêr ê ku herî zêde ji bo ekolojiyê pirsgirêkan derdixe, bi temamî qutbûna ji xwezayê ye.

Gund, bi xwezayê re di nava xwezayê de jiyan dike. Bi her tiştê xwe ve girêdayî xwezayê ye û dizane ku ew bi xwe berhemeke xwezayê ye. Bi lawir, dar û berên xwe ve weke ku bi zimanê xwezayê re biaxive, jiyana xwe didomîne.

Weke zimanekî hevpar, zimanê çandiniyê di serdema gundan de hatibû çêkirin, avabûna civakê di bin bandoreke giran a vî zimanî de bû.

Li bajêr, rewş berovajî ye; bajar her ku diçe ji xweza û çandiniyê qut bûye. Ji ber vê yekê, zimanekî nû yê cuda ji bajêr re derdixe.

Têkiliya di navbera xweza û bajêr de her ku diçe lawaz dibe.

Zimanê bajêr; li ser bazirganî, pîşesazî û pereyan e. Ev ziman, hişê van tiştan û zanista wan ava dike.

Bajar, bi vê çêkera xwe ve û civakên ku li bajêr jiyan dikin, bi rastî jî bi nexweşiya penceşêra civakî ketine.

Her wiha Arîsto jî, bajarekî bi şêniya 10 hezarî nehizirî bû. Îro di bajaran de şênî bi sed hezar, milyonek, pênc milyon, deh milyon, bîst milyon û bîst û pênc milyon çêbûye! Ma gelo ev, bi rastî jî ne mezinbûneke penceşêrî ye?

Ji bo ku bajarekî wiha rojane bê tîmarkirin, bi asayî welatekî mezin di demeke kurt de bi xwezaya wê tunekirinê ve gengaz e.

Tu bingeh ji vê mezinbûna bajêr re tune ye. Aşkereye ku civak û bajar, wê tevî xwezaya xwe û xwezaya yekem jî xerab bike.

Eger bergiriyên pêwîst neyên girtin, encama ku derkeve holê ev e: Tu welat û xweza; bi gelê li wê derê re jiyan dike, nikare demdirêj van mezinahiyan xwedî bike.

Sedema rastîn a xerabûna xwezayê, ev mezinbûna şênî ya penceşêrî ye. Êdî bajarekî welatê xwe û bi gelê xwe tev de dagir dike, yan jî xerab dike.

Hêza nû ya dagirkeriyê; bazirganiya cîhanî (kurewî), yekdestên darayî (fînans) û pîşesaziyê yên li bajaran e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Qeyrana bajarbûnê ya rastî, kengî û weke çi derdikeve holê.**

2- **Gund bi xwezayê re çawa jiyan dike û çawa jiyana xwe didomîne?**

3- **Rewşa bajêr a bi xwezayê re li gorî rewşa gundan, çawa hatiye jiyankirin?**

4- **Zimanê bajêr, li ser kîjan bingehê ava bûye?**

5- **Li bajêr, sedema rastîn a xerabûna xwezayê çi ye?**

6- **Hêza nû ya dagirkeriyê ya li bajaran çi ye?**

WANE 14

ÇAND Û SINCÊ DEWLETÊ

Têgeha dîrokî ya ku di roja me de herî zêde tê bikaranîn, **dewlet** e. Lê belê, têgeha ku herî kêm tê nasîn û tê danasîn jî, dewlet bi xwe ye. Têgeheke ku di nava tarîbûneke mezin de maye. Ji ber vê yekê, divê rastiya çanda dewletê jî, baş were naskirin.

Di wateya teng de dewlet; yekdestiya ku li ser aboriyê hatiye sazûmankirin e. Dewlet; ji bo ku karibe berhem û nirxên zêde ji civakê bidize, xwe di warê bîrdozî de bi rêxistin dike, amûra bîrdozî û darê zorê ta dawî bi kar tîne.

Eger em bendekeyeke giştî bînin ber çavên xwe.

Dewlet= berhem/nirxa zêde + amûr û pergala bîrdoziyê+

amûr û pergalên darê zorê + hunera rêvebirinê

Weke amûr û pergaleke desthilatdariyê, têgeha dewletê weke dêwekî ye. Weke ku ji vê wateyê jî tê têgihîştin, cinawirekî ku ji dagirkeriya bi xwînê têr nabe.

Cureyên dewletên ku hatine avakirin li gorî dîrokê

A - Li gorî çînayetiyên civakî:

1- Dewleta koledar: Mirov bi hemû hebûna xwe, samanê dewletê ye. Ev cure dewlet, awayê dagirkeriyê yê bingehîn ê şaristaniya serdema destpêkê ye. Di vê serdemê de mirovên kole weke amûrên bingehîn ên hilberînê ne.

2- Dewleta feodal: Weke dewleta koledar e, lê bi awayekî nermkirî ye. Ji koleyên kevn re hin lêçûnên ku dikarin malbatê ava bikin, dihatin dayîn. Her çi qasî şert û mercên wan gelek zor bin jî, ji berhem û nirxê zêde re derfetê

didin. Ev awayê dewletê, di serdema navîn de hatiye jiyankirin.

3- Dewleta kapîtalîst: Ev awayê dewletê ku xwe dispêre çîna civakî ya ku jê re **karker** tê gotin. Tenê bi firotina keda wan a li bazarê(sûkê), debara xwe kirinê ji xwe re bingeh digire. Ev dewlet, di serdema şaristaniya kapîtalîst de ye.

B - Li gorî etnîsîteya serweran:

1- **Dewleta rahîban:** Bi riya rahîban dihat birêvebirin, ew ên yekem in ku dewlet saz kirine û têgehên weke; zîgûrat, xwedawend û dewlet jî, ji vir tê.

2- Dewleta xanedanî: Ji dema şaristaniyê û ta niha tê bikaranîn, bi riya malbata ku desthilatdarî di destên wan de ye dihat birêvebirin.

3- Dewleta eşîrî: Ev dewleta ku di bin bandora eşîran de dihat birêvebirin e. Bi taybetî, bi riya olê di serdema navîn de tê dîtin.

C – Li gorî navên wan ên sexte:

1- **Dewleta demokratîk**

Ji ber ku hişmendiya dewletê û demokrasiyê, çêkera civakê û şêwaza rêvebirina wan di bingeh de ji hev cuda ne, dewleta demokratîk nabe. Lê belê, weke hêmaneke bihêz û bibandor di seranserî dîrokê de û zêde di roja me ya niha de neçar bûye ku şaristaniya kapîtalîst ji ber qeyranên xwe (civakî, aborî, çandî, …) yên ku her diçe zêde dibin, bi pergala şaristaniya demokratîk re li hev bikin.

Ango, bi tena serê xwe dewlet nikare bi rê ve bibe. Hatiye rewşa ku bi hêzên demokratîk re hevkariyê çêke. Ji ber vê yekê, lihevkirin gengaz e. Di dîrokê de jî, gelek mînakên vê hatine jiyankirin.

Eger dewlet (awayê wê çi dibe bila bibe), bi rêgezên demokratîk û çêkerên wiha re li hevpariyê bigere û ava bike dikare têgeha dewleta demokratîk bibe xwedî wateyekê. Li gorî vê, danasîna herî rast; dewlet = dewleta demokrasî.

2- Dewleta Zagonî (Qanûnî):

Weke yekdestiya aborî, dewlet ji ber ku serdestiya li ser berheman jiyan dike, nikare di bingeha xwe de dadî be. Lê dikare ji bo hemwelatiyên xwe, li gorî rêgez û zagonên ku ji berê ve diyar kirine, bi zagonên wekhev re tevger bike. Ji vî awayê dewletê re **dewleta zagonî** tê gotin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Dewlet ji bo ku karibe berhem û nirxên zêde ji civakê bidize, çi karî dike?**
2- **Dewletê, weke bendekeyekê pênase bike.**
3- **Cureyên dewletên ku hatine avakirin, li gorî çînayetiyên civakî, binivîse.**
4- **Dewleta rahîban, şîrove bike.**
5- **Dewleta xanedanî, kengî hatiye avakirin?**
6- **Çima dewleta demokratîk, çênabe?**
7- **Çima dewleta zagonî, nikare di bingeha xwe de dadî be?**

WANE 15

ZAGON DI DEWLETÊ DE

Zagon, di dewletê de di nava civakê de bi darê zorê tê pêkanîn. Gengaz e ku bi nivîskî, yan jî bi devkî be.

Di serdema ku civak, ji klan û hozan pêk dihat de mirov nikare zêde behsa zagonê bike. Di van serdeman de rêgezên ku îro em jê re tore dibêjin û bi wateyekê rêgezên ku em weke zagonên xwezayî didin nasîn, tên pêkanîn.



Navê din ê toreyan, sinc e. Cudahiya di navbera sinc û zagonê de yek bi darê zorê tê birêvebirin û ger li gorî wê neyê birêvebirin sizayekî ku ji berê de hatiye diyarkirin, tê dayîn. Sinc jî, ji ber xwe ve bêyî ku tu siza were dayîn, jiyankirin e.

Zagon, vedîtineke girîng a civaka şaristaniyê ye. Bi misogerî bi dabeşbûna civakê, çînbûn û dewletbûnê re dikeve rojevê. Di bingeha wê de sinc heye. Lê belê, çawa ku pîroziyên olî veguherîne dewletbûnê û ketine di bin xizmeta dewletê de sinc jî, rê ji zagonê re vekiriye.

Bi awayekî raste-rast, nabe ku çand û sincê dewletê hebe. Lê belê, çanda ku li ser dewletê bandor dike, dibe ku dewlet hebûna xwe, zagon û hêza xwe bi riya vê çandê biparêze. Ji ber vê yekê, dewlet zêdetir bi zagona xwe ve tê naskirin. Çanda xwe, ji civaka ku xwe dispêre wê, digire. Lê, li şûna pîvana sinc, pîvana zagonê ji xwe re bingeh digire.

Sinc, berhemeke civakî ya wisa ye ku ji destpêka dîrokê ta îro, bê navber tê. Ji ber vê yekê, pîvana wê ne tenê îro, seranserî dîroka civakî dide ber xwe.

Sinc, yekbûna diyardeyên pir zindî, hilberînker û tên pîrozkirin e. Zagon jî, xwediyê taybetmendiyeke sar û pîvanên ji derve ku bi darê zorê tê sepandin e.

Saziya dewletê jî, ji ber ku amûr û pergaleke desthilatdariyê ye, hebûna xwe her tim bi darê zorê, ango tundiya birêxistinkirî domandiye. Ji ber ku, palpişta wê ya bingehîn darê zorê ye û her tim li dijî civakê zagoneke dijwar û li gorî berjewendiyên xwe bi kar aniye. Ji ber van sedeman, di bingeha çanda dewletê de ne sinc, zagon heye. Her wiha, diyar e ku çanda dewletê ji têgeh û diyardeya demokratîkbûnê dûr e. Demokrasî; berhemeke civaka zindî ye, lê dewlet; amûra tundiyê ya li ser civakê ye.

Dewlet, bi darê zorê civakê bi rê ve dibe. Dewlet, di vê xalê de ji bo rewakirina tundiya xwe ya li ser civakê, zagonê bi kar tîne. Zagonên nivîskî yên ku derdixe, asta tundiya li ser civakê diyar dike.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Zagonê pênase bike.**
2- **Di serdema civaka klan û hozan de li şûna zagonê, çi dihat pêkanîn?**
3- **Zagon, ji hêla kê ve hatiye vedîtin û çi cudahî di navbera sinc û zagonê de heye?**
4- **Dewlet, bi çi tê naskirin?**
5- **Saziya dewletê, hebûna xwe bi çi awayî daye domandin û çima?**
6- **Çi têkilî di navbera dewlet û demokrasiyê de heye?**
7- **Dewlet ji bo rewakirina tundiya xwe ya li ser civakê, çi dike?**

WANE 16

QIRKIRINA ÇANDA CIVAKÎ

Ji bo ku hemû mirovahî karibe li ser bingeha azadî, wekhevî û demokrasiyê bijî, pergaleke berfireh a têkiliyan ava kiriye. Ji van têkiliyan re **çanda civakî** tê gotin.

Di qonaxên dîrokê de gelan di navbera xwe de çandeke hevbeş jiyan kiriye. Di her mirovî de bandorên kûr ên çanda hevbeş a ku şopandine, gengaz e.

Vê, weke bingeheke di kûrahiya mejiyê mirovan de cihê xwe giritiye. Mirov di nava xwezayê de hatiye asta zindiyên herî hilberînker û afirîner. Ango çand, çalakiyeke wiha ye ku berpirsiyara mirovbûnê ye. Di seranserî dîroka civakî de diyardeya ku em jê re dibêjin çand, asta mirov a mirovbûnê gav bi gav bilind kiriye û gihandiye îro. Mirov, bi çalakiyên ku li dar xistine, çand afirandiye; çanda ku afirandiye veguhestiye çalakiyê û di encama vê de pîvanên sincî bi dest xistine.

Lê belê, her ku di nava civakê de têgehên weke; dewlet û desthilatdarî peyda bûn, têkiliyên di nava civakê de xerab kirine. Nakokiyên di nava civakê de veguhestine pevçûnên li ser demeke dirêj û li ser hebûna civakî bûne metirsiyên mezin. Di çanda civakî de her kar bi kêfxweşî û bi ruhê alîkariyê dihat kirin. Dema ku karek dihat kirin; berjewendiya kesî nedihat hizirîn û tu kes nedihizirî ku keda kesên din bixwe.

Alîkariya ku didan hev, weke dilpakiyeke mezin dihat dîtin. Mirovên ku di civakekê de jiyan dikirin, bi misogerî sûda wan digihîşt civakê. Berovajî, wan ji xwe şerm dikir û ev ji bo xwe weke şermeke mezin didîtin.

Di roja me ya îro de, gelek tiştên ku wê demê dihatin jiyankirin, mirov nikare pê bihizire. Çanda civakî, her ku diçe tê qedandin û ji aliyê sincî ve xerabûneke mezin tê jiyankirin.

Di demên ku çanda civakî bi awayekî xurt dihat jiyankirin de eger mirovan alîkarî nedabûna hev û dostanî çênekiribûna, di nava civakê de rûreş dibûn. Lê belê, îro pêkanîna van tiştan; an weke ehmeqî, an jî weke tiştekî şerm tê dîtin.

Li şûna jiyana hevbeş; jiyaneke takekesî û li şûna berjewendiyên hevbeş; berjewendiyên takekesî hatine bicihkirin. Ji bo jiyana yekane, jiyana civakî binpê dikin.

Çand jî, bûye weke berhemeke kirîn û firotinê û bûye mijara sûdê. Dema ku çandek bi kêrî qezenckirina pereyan neyê, tu sûdên wê yên daringî nebe, nayê pesinandin û paşverû tê dîtin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çanda civakî, pênase bike.**
2- **Têgehên weke; dewlet û desthilatdarî di nava civakê de çi rist lîstine?**
3- **Di çanda civakî de kar bi çi awayî dihat kirin?**
4- **Kengî mirov di nava civakê de rûreş dibin?**
5- **Jiyana yekane, çi bandorê li ser jiyana civakî û çandê dike?**
6- **Kengî çand nayê pesinandin û paşverû tê dîtin?**

WANE 17

LI HEMBERÎ ÇANDA KOLEDARIYÊ ÇANDA KOMÎNAL



Civaka Komînal

Di civaka xwezayî de ya ku em bi navê civaka komînal a demokratîk bi nav dikin, jiyaneke mirovan a wekhev, azadîxwaz û aştiyane dihat birêvebirin. Di jiyana civakî de xwecihîbûn, xweparastin, pêkanîna pêdiviyên xwe û çêkirina amûran, hemû bi hev ve tên girêdan û nakokiyên civakî zêdetirîn di navbera xweza û mirovan de çêdibin.

Bi destpêkirina civaka çînî re taybetmendiya têkiliyên civakî hatine guhartin û di navbera serdest û bindestan de nakokî hatine gurkirin. Ji ber vê yekê, bi pêşketina çîna şaristaniyê re pirsgirêkên weke; dagirkeriya mirovan, çînayetî, bêmafî, sitemkarî, şer û hwd. rû didin. Di navbera hêzên şaristaniya navendî ya serwerên dewletan û çêkera çanda komînal a bingeha xwe ji civaka xwezayî digire, têkoşîneke mayînde û demdirêj tê destpêkirin.



Di her cih û serdema ku êrîş û dagirkeriya hêzên şaristaniya navendî heye de civakan her tim rê û rêbazên xweparastinê pêş xistine û di nava lêgerîna van rêbazan de bûne. Bi derketina şaristaniya navendî re jiyan û çanda civaka komînal di felcbûnê re derbas bûye. Li hemberî vê, di nava

xaka Rojhilata Navîn de berxwedanên mezin ên di asta neteweyî û olî de hatine pêşxistin. Ji bo ku civak xwe bigihîne nasnameyeke azad, lêgerên xwe yên derveyî bîrdoziya fermî berdewam kirine. Serdestiya destpêkê, xwe di hişmendiyê de bi cih kiriye. Li hemberî vê, azadî jî destpêkê xwe di hişmendiyê de bi rêxistin dike.

Taybetmendiya herî girîng a kevneşopiya berxwedaniyê, vegera sincê civakê û derbaskirina qeyrana pergala koledar a şaristaniya hemdem e. Ji bo derbaskirin û rakirina van pergalên koledar, dibe ku ev tevger kêm mane. Lê belê, bi tekoşîna xwe ew pergalên koledar nerm kirine û anîne rewşa jiyankirinê. Her wiha, rê li ber gava yekem a derbaskirina koledariya yekem vekirine. Ev qeyrana şaristaniyê, hatiye xwestin ku bi koledariya kevnar re were derbaskirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Di civaka xwezayî ya bi navê civaka komînal de çi rêbaz dihatin birêvebirin?**
2- **Di jiyana civakî de çi hêman bi hev ve tên girêdan?**
3- **Di civaka komînal de nakokiyên civakî di navbera çi de derbas dibin?**
4- **Bi destpêkirina civaka çînî re çi guhartin çêbû?**
5- **Bi pêşketina çîna şaristaniyê re çi rû da?**
6- **Civakan, kengî rê û rêbazên xweparastinê pêş xistine?**
7- **Bi derketina şaristaniya navendî re jiyan û çanda civaka komînal, bi çi awayî derbas dibin?**
8- **Taybetmendiyên herî girîng ên kevneşopiya berxwedaniyê, çi ne?**

WANE 18

BERXWEDANA HOZ Û EŞÎRAN

Di dîrokê de hemû serdest ketine nava hewldana sitemkarî û fişara veşartinê. Bi hin ramanên bîrdozî ve ser rastiyên hene nixumandine û veşartine. Xwestine ku kiryarên xwe, weke fermana xwedê bidin diyarkirin û erêkirin. Lê belê, hin beşên civakî yên pir mezin, bi zanabûna van nêzîkatiyên serdestan, ketine nava lêgerên jiyaneke cudatir. Bi taybetî, dikare lêgerînên jiyana hoz û eşîrên berxwedêr, weke mînak werin nîşandan. Ji ber ku, ev beşên civakî piraniya xwe bi van pergalên koledar û dagirker rû bi rû mane.

Di dema şaristaniya koledariyê ya dewletî de, gelek etnîsîteyên derveyî pergalê û di hundir de gelek beşên nerihet, destwerdana pergalê kirine. Biyanîbûna li ser pergalê, hatiye fişarkirin û êrîşên ku hatine pêşxistin çi qas mezin hatibin berdewamkirin, berxwedaniya li hemberî van jî, ew qasî bilind bûye.

Ev berxwedanî, bi xwe re vegera bingeha sincî jî ava kiriye. Hêza berxwedana gelê kurd a koledariyê, nemaye. Bêsazûmanî jî be, li hemberî koledariyê di gelek deverên çiyayî yên veşartî de bi pêşengiya hin eşîran berxwedanên mezin hatine pêşxistin.

Di xaka Mezopotamyayê de berxwedanên ku li hemberî desthilatdarên Asûr pêş ketine, mînakên van berxwedaniyan e.

Di xaka Mezopotamyayê de li hemberî stemkariya desthilatdarên Asûr, bi nasnameya Medan berxwedanî hatiye pêşxistin û bi baweriya Zerdeşt ve hatiye hûnandin.

Li gorî vê, ber bi felsefeya jiyana azad ve gav hatiye avêtin. Felsefeya Zerdeşt, di nava civakê de rê li ber pengavên mezin ên çanda civakî vekiriye. Ji xwe serkeftina Medan, bi vê berxwedaniyê bi encam bûye. Lê belê, bi demê re ev baweriya Medan ji aliyê dewleta Îranê ve hatiye fermîkirin û ji cewhera xwe hatiye dûrxistin.

Bi pêşengiya Zerdeşt, li hemberî koledariyê pêleke berxwedaniyê ya nû destpê dike. Felsefeya sinc a Zerdeşt, weke çanda neolîtîkê bandorên xwe li her devera jiyanê diyar dike.

Feylozofên yewnanî yên ku demeke dirêj li akademiyên Mezopotamyayê dihatin perwerdekirin, ev çand derbasî rojava kirine.

Felsefeya sinc a ku bi Sokrates re derbasî rojava bûye, di felsefeya Girîkan de ravekirina xwe dibîne. Her wiha, li Hindistanê li hemberî Brahmayên rêvebir, berxwedaniya Bûda ji van berxwedaniyan re mînak e. Di heman demê de li hemberî koledariya Çînê derketina Konfuçyûs jî, dikare di vê mijarê de were nirxandin.

Di bingeha van berxwedanên olî de lêgera civaka azad heye. Derketina yekem a olî, dibe hewldana ji nû ve avakirina nasnameya azad a civakî. Bi demê re ev hatiye xwestin, ku ev nasname bi hin rêgezên hişk û doxmayên teng were serwerkirin. Di vê rewşê de jî, cardin civak bi girêdaneke hişk pê ve tê girêdan. Ji ber ku civak; wate, nasnama û azadiya xwe di vir de dibîne. Her wiha, civaka ku nasnameya pêxemberî û xwedayî bilind dike, di heman demê de nasnameya xwe ya azadiyê jî bilind dike û wateya xwe zêde dike.

Di vê demê de hoz û eşîrên çol û çiyayan, pêşengên berxwedaniyê ne. Li hemberî Nemrûdê sitemkar û xwînxwar,

berxwedan û berdewamiya ola Îbrahîmî, di avakirina hişmendî û nasnameya Rojhilata Navîn de pêvajoyeke nû diyar dike. Êdî li hemberî bîrdoziyên derewîn, xebateke bîrdozî û hişmendiyê ya birêxistinkirî tê destpêkirin. Di nava vê berxwedaniyê de nasnameya azad û berxwedaniyê ji nû ve reng digire. Ev hişmendiya berxwedaniyê, wîjdana mirovahiyê radike ser piyan.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çima hoz û eşîrên berxwedêr, bi nêzîkatiyên serdestan re ketine nava lêgerên jiyaneke cudatir?**

2- **Li ku derê pêşengên eşîran, berxwedaniyên mezin pêş xistine?**

3- **Kê li Mezopotamyayê, li hemberî sitemkariya desthilatdarên Asûr, berxwedanî pêş xistiye?**

4- **Felsefeya Zerdeşt, di nava civakê de rê li ber çi vekiriye?**

5- **Bi çi awayî baweriya Medan, ji aliyê dewleta Îranê ve hatiye fermîkirin?**

6- **Felsefeya sinc a Zerdeşt, li her devera jiyanê çi diyar dike?**

7- **Civaka ku nasnameya pêxemberî û xwedayî bilind dike, tê çi wateyê?**

8- **Navê çend feylozofên ku li hemberî koledariyê rabûne, binivîse.**

WANE 19

ÇANDA PÊXEMBERIYÊ- 1

Pêxemberî, weke kevneşopî; di pêvajoya dîroka şaristaniya koledar de li hemberî pergala dewletî ji hundir ve hatiye pêşxistin. Vê kevneşopiyê, hewl daye ku di nava civakê de guhartin û reforman bide çêkirin. Ev dem, bi Hz. Adem re dest pê kiriye û bi Hz. Muhemmed re bi dawî bûye.

Çanda pêxemberî, tê wateya çanda agahdariyê û rê li ber pêşketinên mezin vekiriye. Ev jî, niha ji van encaman tê têgihîştin. Ji aliyekî ve tê wateya Şêxê afirîner.

Derketinên pêxemberî, di bin navê ola nû de ava dibin. Tevgera berxwedaniya eşîr û hozan, li hemberî pergalên desthilatar in. Lê, ji ber ku ne di hêza derbaskirina pergalan de ne, encax karibin pergalan ber bi guhartinan ve tengav bikin, an jî li derveyî pergalan, weke riyeke sêyem di erdnîgariyeke berfireh de bandor bibin. Ev bandoriyên xwe jî, diyar kirine.

Di demên dewleta koledar a şaristaniyê de berxwedaniyên etnîsîteyan ên li hemberî dagirkeriya pergalên desthilatdar, pêxemberiyê diyar dike.

Împaratoriya Roma ya pêşketî, dema ku koledarî jiyan dikir, bi serhildanên etnîsîteyan û têkoşîna xiristiyanan ên ve hatiye derbaskirin. Di encama van her du têkoşînan de împaratoriya Romayê têk çûye û derbasî pêvajoya dema derebegî/feodalî bûye.

Têkoşînên ku bi etnîsîteyan ve girêdayî, piranî di nava komên Aryen de hatine jiyankirin. Kevneşopiya pêxemberî jî, di nava komên Semîtîk de weke forma berxwedaniyê hatiye pêşxistin.

Li gorî hin lêkolînan, hejmara pêxemberan gihîştiye 124 hezarî. Di rastiya xwe de pêxember, pêşengên civakê û tekoşînê ku li hemberî pergala dewletî û dagirkeriyê bi rê ve dibin. Vê hêza xwe, ji bo avakirina civaka nû û vegera civaka sincî bi kar anîne. Li hemberî pergala koledar, ji bo nirxên dadî, wekhevî û demokrasiyê têkoşiyane.

Di heman demê de ev dibe têkoşîna komînal a komên civakî yên li derveyî dewletê dimînin. Lê belê, her çi qasî armanc, daxwaz, xewn û xeyalên wan, di çarçoveya nirxên komînal de jî bin, ev di karîgeriyê de pir zêde nehatiye avakirin. Hêz, hişmendî û jêhatîbûna wan a hizirandin û kûrbûnê û kesayeta wan, têra derbaskirina wê pergala hiyerarşîk a dewletî nekiriye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çanda pêxemberî, tê çi wateyê?**

2- **Pêxemberî weke kevneşopiyekê, kengî hatiye pêşxistin?**

3- **Kevneşopiya Pêxemberî, çi rist di nava civakê de lîstiye?**

4- **Çawa împaratoriya Romayê têk çûye û derbasî pêvajoya dema feodalî bûye?**

5- **Hejmara pêxemberan gihîştiye çi qasî û rista pêxemberan a di civakê de çi bû?**

6- **Pêxember, li hemberî pergala koledar, ji bo kîjan nirxan têkoşiyane?**

WANE 20

ÇANDA PÊXEMBERIYÊ- 2

Ji bo avakirina alternatîfên nû û bingeha jiyaneke lihevhatî, hêza wan têrê nekiriye. Beriya her tiştî, ji ber ku ew weke nûnerên çîna navîn bûn, nikarîbûn bigihêjin veguhartinên cidî. Di van aliyan de reformxwaz mane. Armancên wan baş in, lê belê ji bo pêkanîna van armancên xwe, ber bi riyên pêşengiyan ve guherîne. Ji ber vê yekê, nikarîbûn xwe ji dijberiya armancên xwe rizgar bikirana. Hema hema hin pêxember, di encama bîrdoziya xwe de bûne beşeke pergalê û ew zêdetir bi hêz kirine. Dema pergalên dewletî pûç bûne, weke di mînaka Xiristiyanî de jî diyar dibe, hêza olê ji bo xwe radigirin û bi riya olê temenê xwe dirêj dikin. Di vê wateyê de ol bûye kevneşopiyeke bihêzkirina dewlet û sermiyanan. Ji bo berjewendiyên wan hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê, kevneşopiya olî, bûye bingeha xurtkirina pergala koledarî ya ku li hemberî wê gelek têkoşîn kirine û bacên pir mezin dane. Ev rastî, ji derveyî armanc û daxwazên wan hatine pêşxistin.

Saziya pêxemberî, tevgerên civakî yên ramyarî û bîrdozî ne, her wiha pir bihêz in. Bi awayekî pir dijwar, ji efsaneyên Sumer û Misiriyan bandor bûne. Ev efsane, ji bo xwe kirine bingeh. Lê belê, gelek aliyên efsaneyan têgeha xweda bi demê re derbas kirine.

Saziya pêxemberî bi xwe, nûnertiya çîna navîn dike. Her wiha, bingeha pêşketinên çînî û xweser ava dike. Ji ber ku ji beşên civakî yên jêr hatine, di nava civaka xwezayî de cihê xwe girtine. Ne misoger e ku bîrdoziyeke wan a serbixwe û radîkal hebe.

Tevgerên olî, bi demê re bûne pergalên dewletî yên desthilatdar û li gorî wan şêwe girtin. Ev şêwegirtinên li dijî

civakê, cîhanê weke cihekî bi lanet, sûcdaran û sezakirinê dibîne. Ji ber ku nêzîkatiya wan a ji xwezayê re gelek çewt e. Her wiha, rewşa jinan a ku bingeha hemû civakê eşkere dikin, ta radeya dawiyê paşverû dibînin. Nêzîkatiyên wan ên ji jinan re hem paşverû, hem jî pir lewaz in. Jinê, weke gunehkara yekem a mirovahiyê dibînin. Ji aliyê hebûnê ve jinê, weke hebûna duyem û zindiya kêm dibînin. Li gorî zanista wan, jin ji parsûya zilam hatine afirandin.

Êrîşa pêxemberan a li ser civaka hemdem a ku pûtan diparêze û êrîşa li ser rêveberiyan di bingeha xwe de heman tişt e. Dij-pûtparêzî, dij-dewletîbûn e. Hemû têgeh û nîşaneyên bi navê sazîbûna civakan, di nava van êrîşan de bi cih dikin. Ji destpêka ola yek xwedayî ya Îbrahîmî ve ta dema Mûsa, ev weke kevneşopiya olî hatiye berdewamkirin. Bi demê re bûye kevneşopî û wêrekiya qutbûna ji rastiya civaka Misir û Sumeran eşkere dike. Ev qutbûn, bi serê xwe pêşkêşiya viyana civakî ye.

Derketina Nûh bi serê xwe, çîroka avakirina pêvajoyeke nû ye. Weke ku li hemberî efendiyên zordest Hz. Nûh xwestiye ku hemû mirovahiya bi çanda neolîtîkê xemiliye, bixe keştiya mirovahiyê û bibe quntara çiyayên ku tu şaristanî nikare xwe bigihîne wê derê. Ev çîrok, behsa berxwedaniya civaka Sumeran û civaka xwedî çanda neolîtîkê dike. Dîroka pêxemberan; dîroka berxwedaniya çanda gelerî, hoz û lehengiyan e.

Di nava van hemû berxwedanî û çandan de hêmana bingehîn, li hemberî pûtparêziyê derketin e.

Li hemberî vê, dîroka xanedaniyê jî heye. Ev dîrok û çanda berxwedanê, li hemberî çîna zordest têkoşiyaye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çima pêxemberan, nikarîbûn xwe ji dijberiya armancên xwe rizgar bikirana?**
2- **Çawa ol, bûye kevneşopiyeke bihêzkirin û sermiyanê dewletê?**
3- **Saziya pêxemberî, tevgereke çawa ye?**
4- **Dema ku tevgerên olî bi demê re bûne pergalên dewletî yên desthilatdar û li gorî wan şêwe girtine, çi encam dane?**
5- **Nêzîkatiyên tevgerên olî, ji jinan re çawa hatine dîtin?**
6- **Kevneşopiya olî, bi çi awayî hatiye berdewamkirin?**
7- **Armanca Hz. Nûh a ji çêkirina keştiyê, çi ye?**

WANE 21

ZERDEŞT- 1

Zerdeşt

Tê gotin ku Zerdeşt di navbera (628-551) B.Z. de jiyan kiriye. Nasnameya Zerdeşt a etnîkî, nebûye pirsgirêk. Hemû lêkolîn nîşan dikin ku koka wî, ji Medan e.

Di zivistanên Zaxrosê yên sar de civak û hozên Med, li derdora agir piraniya jiyana xwe li gel rahîbên bi navê Magan derbas dikin. Ji bo ku rêhevaltî û şîretên herî xweş, li derdorên wan derbas bikin.

Di Zerdeştiyê de pîroziya agir tê zanîn. Ji ber ku ji jiyana xwe ya rojane dizanin ku derveyî agir, jiyaneke din tune ye. Bi baweriyeke mezin tê zanîn ku li bakurê rojavayê Îranê, ango li Medyayê şoreşa çandiniyê hatiye jiyîn. Zerdeşt, her çi qasî weke pêxember were nirxandin jî, sekna wî nêzî feylozofiyê ye. Zerdeşt; feylezofekî zana û pêşketî ye. Pirtûka Zerdeşt a pîroz **Avesta** ye. Ev pirtûk, ji ber bi kurdiyeke resen hatiye nivîsîn, tê tekezkirin ku Zerdeşt bi xwe kurd e.

Zerdeşt, pergala baweriya Aryen a yekem di reformê re derbas kiriye. Ji ola ku Zerdeşt ava kiriye re **Mazdeîzm** tê gotin. Zerdeşt bi Mazdeîzmê, ber bi yek xwedabûnê ve diçe. Bi hêza xwe, kombûna pir xwedayî derbas dike. Zerdeşt, her tim pirsa; xwedayê ku xerabiyan nabexişîne, dike. Ji ber vê yekê, li hemberî xerabiyan, bi baweriya zagona xwedê têdikoşe. Ew, vê pêvajoyê; ji pergala sê baweriyan, derbasî pergala yekbaweriyê dike. Jixwe, yê ku bi qasî vê bi ser dixe, pêxember e. Ji xwedawendên serdema Aryan ên bi navê **Îndra, Mîtra û Varûna** ber bi yek nav, an jî yek pergalê ve Ahûra Mazda (xweda-Allah) diçe. Di vê wateyê de di nava

erdnîgariya Îran, Anatolya û Medyayê de pêvajo derbasî baweriya yek xwedayî kiriye. Di avakirina têgehên weke; bihişt, dojeh, riya rast(sirat), ferîşte(melek), qatên asîman, roja rabûnê(mehşer), dadgeha mezin û başî-xerabî de xwedî risteke mezin e.

Aliyê wî yê feylezofî, pir zelal e. Li ser bingeha sincê mezin, feylezofiya xwe dide rûniştandin. Li ser yekbûna dijberên weke; başî-xerabî, tarî-ronahî dide rûniştandin. Ev, di felsefeya Zerdeşt de diyalektîka bingehîn e. Cara yekem, azadiya vîna mirov nas kiriye. Di felsefeya wî de vîna azad bingeh e û dibe destpêka reda koledariya mirovan.

Zanista wî, bi tevahî di vê xalê de di navbera ol û felsefeyê de veqetînê dide çêkirin. Ev veqetîn, di jiyana mirovan de pêvajoyeke pir girîng diyar dike. Li gorî lêkolînên ku hatine pêşxistin, di avakirina felsefeya rojhilat û rojava de ev dualîbûna hizirandinê, bûye bingeha pêşketina şaristaniya dualî. Ya rastî, dibe gava yekem.

Baweriya Zerdeşt, eşkere dike ku cîhan di çar qonaxan re derbas bûye.

Dema yekem: Başî û xerabî derketiye holê.

Dema duyem: Cîhan di bin tarîbûn, bobelat û xerabiyan de dimîne.

Dema sêyem: Di tekoşîna başî û xerabiyê de başî bi ser dikeve. Zerdeşt, bi nîşandana başî û xerabiyê re dixwaze ku her kes karibe ji aliyê dadê ve başî û xerabiyê nas bike.

Dema çarem: Xerabî û tarîbûna bi her awayî, wê bi dawî bibe. Di encamê de aştî û biratî wê bi ser bikeve.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Kengî Zerdeşt jiyan kiriye?**
2- **Çima hozên Med, piraniya jiyana xwe ya li gel Magan derbas dikirin?**
3- **Navê ol û pirtûka pîroz a Zerdeşt, çi ye?**
4- **Çima Zerdeşt li hemberî xerabiyan, bi baweriya zagona xwedê têdikoşe?**
5- **Navê çend xwedawendên serdema Aryen, binivîse.**
6- **Zerdeşt di avakirina kîjan têgehan de xwedî risteke mezin e?**
7- **Li gorî baweriya Zerdeşt, cîhan di çend qonaxan re derbas bûye? Diyar bike.**

WANE 22

ZERDEŞT- 2

Di raman û fesefeya Zerdeşt de rêgeza bingehîn, bi awayê; '**hizirandina baş, gotina baş, çalakiya baş**' hatiye bendekeyekirin. Di vê demê de gelek zanistên wekhev derdikevin holê. Tê armanckirin ku ew jiyana civakî ya ku ber bi rizandinê ve diçe, bi zanisteke rast di reforman re were derbaskirin. Li herêma Medyayê, di bingeha reforma bîrdoziyê de sûda herî mezin, Zerdeşt daye. Diyar kiriye ku ji bo pêşiya rizîna civakê were girtin, divê di serî de pêşiya hizirandina şaş were girtin.

Hizirîna baş, bi xwe re gotina baş û çalakiya baş derdixe holê. Heger ev her sê alî bibin yek û werin bikaranîn, civak dikare xwe bigihîne sincê rast.

Di efsaneneyên Sumer û Misirê de zanista ku piştgiriya vê olê dike, vê zanînê bi hemû mirovan dide pejirandin. Li her deverê, têgeha beniyê ku xwespartina xweda li ser wan serwer dike, benî neçar û bêhêz in, mirov nikare bibe xwediyê xwe. Her tişt, ji xweda tê.

Her wiha, vîna çîna serdest a ku nû bilind dibe, xweser û pîroz e. Bê destûr, kes nikare li siya xwe xwedî derkeve. Li ser hişmendî û ruhê demê, ev bîrdozî serwer e. Encama vê ya ramyarî, dibe xweda-qralê bêdilovanî. Her tim, peyva qral di asta zagonê de ye. Zerdeşt, beriya her kesî li hemberî van zagonan berxwedan kiriye. Ev şêwe, nepejirandiye.

Bingeha xwe ya ku pêk aniye, di şoreşa felsefeyê de ye. Di nava civakê de jî şoreşa sincê civakî ya herî mezin e.

Di kesayeta wî de hezkirineke mezin a lawiran heye. Dibêje; ‘em van lawirên ku di jiyanê de ji bo me ew qasî bi sûd in, ser jê nekin’. Ew, di heman demê de pêxemberê şînatiyan e. Girîngiyeke mezin dide şînatiyan û çandiniyê. Bi pevjîna (Havoya)xwe re, jiyaneke bisinc didomîne.

Zerdeşt, beriya ku Konfuçyûs li Çînê, Bûda li Hindê û Sokrat li Grîk derkevin, derketiye û reforma xwe ya sincî pêk aniye. Di vî alî de ew dibe pêşengê sinc ê yekem. Tê gotin ku bi riya Medan, çanda Girîkan bandor kiriye. Di dîroka Heredot de gelê Med cihekî mezin digire. Di wê demê de weke gelê bi navê Persan zêde derbas nabe.

Heyranbûna feylezof Nîtçe (Nietzsche) a ji bo Zerdeşt girîng û baldar e. Nîtşe, feylezofekî zû bi zû bi pêşbîniyan nêzîk nabe. Her mijara ku bi pêşbînî nêzîk dibe, di asta penda(aforîzma) de ye. Xwe weke şagirt, an jî xwendevanê Zerdeşt dide naskirin.


Nîtçe

Nehatina çanda Zerdeşt ta roja me ya îro (dibe ku hemû berhemên vê çandê di vê demê de li cem gelê zerdeştiyan mabin), bi navê mirovahiyê tê wateya windahiyê. Dikare were gotin ku monarşiya Îranê, naveroka vê çandê bi tevahî vala kiriye. Xwediyê rast ê vê çandê, Medî bi xwe ne. Xiristiyanî û Îslamiyeta ramyarî di dorpêça vê çandê de xwedî bandoreke neyînî ne. Jixwe, ji van olên ku ji naveroka wan hatine dûrxistin, xwedî çarçoveyên hişk, teng û doxmatîk jî, ev nêzîkatî tê hêvîkirin. Li pêşiya sincê Zerdeştî, weke astengên bîrdozî hatine rawestandin. Her wiha, bi bergeriyên gelek tund hatiye rawestîn. Bi taybetî, ji aliyê îslama ramyarî û radîkal ve ev tundî hatiye bikaranîn. Tê gotin ku derbeya herî giran di dema şerên îslamê de xwariye.

Gelek belgeyên ku di dest de hene, pir zêde rastiyan eşkere nakin.

Berxwedanên ku ji aliyê komînalîstên navdar ên weke; Mazdek û Babek ve hatine pêşxistin, di asta qad û herêmê de weke nûnerên Zerdeştîzmê yên dawî ne. Her du jî li hemberî monarşiya Îran-Sasanî ya riziyayî û sultaniya Ebasî ya di nava kêf û coşiyê de weke mînakên berxwedaniyên mezin in. Li ser Mîtraîzm û Manîtiyê jî bandorên wan girîng in.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Di zanista Zerdeşt de rêgezên bingehîn bi çi awayî hatine bendekekirin?**

2- **Zerdeşt, di bingeha reforma bîrdozî de sûda herî mezin a ku daye, çi ye?**

3- **Li gorî nêrîna Zerdeşt, civak çawa dikare xwe bigihîne sincê rast?**

4- **Helwesta Zerdeşt a li hemberî qral, lawir û şînatiyan diyar bike.**

5- **Çima Zerdeşt bûye pêşengê sinc ê yekem?**

6- **Çend taybetmendiyên feylezof Nîtçe, diyar bike.**

7- **Çima çanda Zerdeştî, nehatiye ta roja me ya îro?**

8- **Bandora îslama ramyarî û radîkal a li ser çanda Zerdeştiyê, diyar bike.**

9- **Navê çend komînalîstên navdar, binivîse.**

WANE 23

BÛDA



Bûda

Navê wî yê rast Gautama ye. Damezirînerê ola Bûdîzmê ye. Bûda bi xwe, kurê qral Sudhodana ye. Navê diya wî, qralîçe Maya ye. Piştre, navê Bûda ango kesê bi xwedê bandor bûye digire. Ev mirovê zanist, di sedsala 6'an B.Z. de li Bakurê Hindistanê ji dayîk bûye (563-483 B.Z.) Pêvajoyeke ciwanî û xweş jiyan kiriye. Lê rojekê dibe govanê(şahidê) êşkişandina mirovan. Ev roj, hemû jiyana wî serûbin dike. Di 29 saliya xwe de rojekê li bin dara hejîrê rûniştiye. Di wê kêliyê de hizirandinek, wî dorpêç dike. Dibîne ku çavkaniya hemû êşan, çavberdana malê gel e. Her wiha, dibîne ku riya rastî û kêfxweşiyê, xwegihandina nîrvana ye û ji bo vê, divê bi misogerî xwe ji xwestekên kesî dûr bixe.

Bûdîzm, di sedsala 6'an B.Z. de weke dijberiya Brahmanîzmê derdikeve holê. Xwedayên Brahmanîzmê û cudabûnên kastê, xizanî û birçîbûna ku mirovan jiyan dikir, jiyana bi milyonan mirovî bandor kiriye. Bûda, ji van mirovan re riya xwespartina nîrvana û berdana dest ji cîhanê dide fêrkirin. Eşkere dike ku encax bi vê riyê dikarin xwe ji êşên cîhanê rizgar bikin. Bûda, behsa navê xweda nake.

Li gorî Bûda, çar rastiyên bingehîn hene.

- Rastiya kişandina êşê. (Di çavkaniya hemû heyberên ku hev du bi hev ve girê didin de êş heye.)

- Rastiya daxwazê (êş, ji daxwaza mirov ava dibe.)

- Rastiya dawîkirina êşê (êş; encax xwe ji her tiştî qutkirinê, bi gotineke din bi nîrvanabûnê tê bidawîkirin.)


Rewşa nîrvanabûnê

- Rastiya heşt riyên ku êşan bi dawî dikin; (baweriya rast, vîna rast, gotina rast, çalakiya xwerû, amûrên debarê yên rast, xebata paqij, mejiyê zelal û hizirandina zelal)

Bûdîzm, ji olê zêdetir nêzî felsefeyê ye û fêrî şîretên felsefeyê dibe. Dibêje; nekujin, mal û jina kesî nestînin, derewa nekin, êş û kêfxweşiyên li derdora xwe parve bikin, baş û dilovan bin, xwedî hêrs nebin û xerabiyên li we hatine kirin, bibexşînin. Bûdîzm; bisincbûn, bihişbûn û dûrbûna ji xerabiyan bingeh digire.

Di baweriya Hindê de Bûda li hin deveran kesê xwedayî, li hin deveran kesê pêxember û li hin deveran jî kesê rizgarvan e.

Li gorî wî, ji bo ku mirov tiştên hêvî kirine û bi dest nexistine; ne kêfxweş in. Kesên ku dest ji van xwestekan berdin, wê şanaz bin. Demekê ji bo ku êş neyê kişandin, divê tu tişt neyê xwestin.

Pêkanîna rêgezên Bûda û bi tekûziya jiyana rast, ew jiyankirin bi xwe Bûdîzm e.

Li gorî Bûda, di gerdûnê de tiştekî ku mirov pê ve were girêdan, tune ye. Ne di bedenê de û ne jî di can de tiştekî bêdawî tune ye. Ne bingeh, ne jî şêwe heye. Her tişt tê û derbas dibe. Cîhan derew û vala ye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Nasnameya Bûda, diyar bike.**
2- **Di 29 saliya Bûda de çi hizirandin wî dorpêç dike?**
3- **Xwedayên Brahmanîzmê û cudabûnên kastê, li ser mirovan bandoreke çawa kirine?**
4- **Li gorî Bûda, çawa mirov dikarin xwe ji êşên cîhanê rizgar bikin?**
5- **Rastiyên bingehîn ên li gorî Bûda, diyar bike.**
6- **Rastiya riyên ku êşan bi dawî dikin, çi ne?**
7- **Bûdîzm, çi ye? Rêgezên wê diyar bike.**
8- **Çend taybetmendiyên Bûda yên li Hindistanê, binivîse.**
9- **Gerdûnê, li gorî Bûda şîrove bike.**

WANE 24

KONFUÇYÛS

Konfuçyûs, bi navekî din Kung Fu-Tzu (Oste Kong), di navbera salên 551-479 B.Z. de jiyan kiriye. Di sê saliya wî de bavê wî jiyana xwe ji dest daye. Salên jiyana wî yên destpêkê bi zehmetiyan derbas bûne. Di 15 saliya xwe de xwe cangorî zanistê kir. Di 19 saliya xwe de pevjin bûye û du zarokên wî çêbûne.

Di 20 saliya xwe de dest bi perwerdeya xwendekaran kir. Ew, mirovekî ramyardar bû. Xawên (fazîlet) û hunerên şarezayên berê şîrove dikir û bawer dikir ku wê bi van aştî û rêveberiya baş, werin pêkanîn. Mînaka wî ya jiyanê; başî û xwe gihandina zelaliya bingeha mirov e. Xwendekarên wî, li pêşberî wî; sekneke bi rêzdarî, hezkirî û girêdayî raber dikirin. Ji wî; dîrok, wêje, felsefe û sinc fêr dibûn.

Di 50 saliya wî de di qada encûmena dewletê de jê re erk hat dayîn. Piştî 13 salan ji bo ku hizirandinên xwe bide pejirandin, li hemû qesran geriya. Ev ger, weke pêvajoyeke surgûnê domiya. Wekî din, mirina xwendekarê wî yê herî baş, ew gelek bandor kiribû. Beriya mirina xwe jî, cardin bi xwendekarên xwe re têkildar bû.

Konfuçyûs, tu nirxekî zêde nade cîhanê. Sinc û rêgezên wê, di ser her tiştî re dibîne. Bi van taybetmendiyên xwe, ji aliyê derdora xwe ve gelekî tê hezkirin. Li gorî hinan, ji ber erk û rayeyên began nepejirandiye, ji wî re gotine qralê bêkulah(bêtac). Konfuçyûs jî, weke Sokrates tu belgeyên nivîskî li pey xwe nehiştine. Xwendekarên wî, piştre

têbîniyên wî yên waneyan berhev kirine û kirine pirtûk. Li gorî hinan jî, Konfuçyûs di gerên xwe de gelek têbînî girtine û ev têbîniyên xwe, piştre kirine pirtûk. Lê belê, tu pirtûkên ku Konfuçyûs bi xwe nivîsîye, negihaştiye roja me ya îro.

Konfuçyûs, di dîroka Çînê de ramyardar û hizirmendê herî navdar e. Bi hizirên xwe, li ser şaristaniyên Başûrê Rojavayê Asyayê, gelekî bandor kiriye. Şêweyê jiyana Çînê ya 2000 salî ku gelê Çînê pê ve girêdayî ye, kombûna nirxan û baweriyên olê, weke Konfuçyûsî tê bibîranîn. Weke kesayeta Konfuçyus, zanista wî jî; xwezayî, zelal û mirovperest bû. Peyva wî ya giştî; dilpakî, hezkirin, dilê mezin, an jî mirovhezî bû.

Konfuçyûs

Felsefeya Konfuçyûs, bi giranî felsefeya bisinc û ya ku ramyariyê ve girêdayî bû. Li ser vê bingehê, bawer dikir ku erd-ezman çi qas di nava gerdûnê de mezin bin jî, di heman demê de ew hêz, hev du hevseng dikin.

Li gorî Konfuçyûs, mirov jî tevlî vê hevsengiyê ye. Divê mirov gerdûnê mînak bigire û weke wê tevbigere. Di zanista wî de ev tê gotin: “ev hevsengî koka herî girîng a ku hemû mirov ji wê diafire. Divê her kes di nava vê hevsengiyê de be. Ev hevsengî, riya lihevkirina gerdûnî ye.”

Li gorî Konfuçyûs, hemû zanînên civakî û ramyarî; taybetmendiyên mirov ên berfireh in. Perwerde bi xwe, zanista sinc e. Lê ev zanîn, bi hin çalakiyên diyar û bi helwestên encam baş, bi dawî nedibû. Di heman demê de di karîgerî û ezmûnan de jî dihat pêkanîn. Her wiha, zanîn di pêkanina kiryaran de dibû bingeh. Kesên ku van zanînan digirin, li ser bingeha alîkariyê fêrî derdora xwe jî dikin.

Konfuçyûs, vî şêweyê perwerdeyê di cih de dibîne û dibêje; divê her kes di temenê biçûk de vî şêweyê perwerdeyê bigire û ta dawiya jiyana xwe bidomîne.

Ji bo mirov û zanist, Konfuçyûs di wê baweriyê de ye ku mirovê herî baş, mirovê xwedî zanist e. Lê xwe, weke mirovekî zana nabîne. Dihizire ku pir kêm mirov xwe digihînin sînorê zanistê. Ji bo efendî jî dibêje; di bêkêmasiya xwe de piştî zanistê tê û divê ev efendî, bandor û giraniya wî di hemû demên jiyanê de derbas bibin.

Konfuçyûs ji bo rêveberan dibêje; 'heger hûn baş bin, wê mirovên derdora we jî baş bin'. Ji ber ku xwezaya mirovê efendî, weke bayê ye û ya mirovê asayî jî, weke giya ye. Dema ba tê, giya xwehr dibe. Ji ber ku rêveberî, her tim mirovan diguhere, divê ev rewşa guhartinê di nava civakan de ji aliyê; hezkirin, rêzdarî û başiyan ve be. Dema ku civak û komikên civakî, ji aliyê rêveberên baş ve werin birêvebirin, wê civakeke wekhev were avakirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Konfuçyûs, di 15 û 20 saliya xwe de çi xebat kiriye?**
2- **Mînaka Konfuçyûs a jiyanê, çi bû?**
3- **Xwendekarên Konfuçyûs, jê fêrî çi dibûn?**
4- **Çawa Konfuçyûs sinc û cîhanê dinirxîne?**
5- **Felsefeya Konfuçyûs, bi giranî felsefeyeke çawa bû?**
6- **Çima Konfuçyûs di dîroka Çînê de ramyardar û hizirmendê herî navdar e?**
7- **Li gorî Konfuçyûs, taybetmendiyên mirov ên berfireh çi ne?**
8- **Helwesta Konfuçyûs a ji bo mirovê efendî û rêveber, diyar bike.**
9- **Li gorî Konfuçyûs, çawa wê civakeke wekhev were avakirin?**

WANE 25

SOKRATES


Sokrates

Sokrates**:** (470-399) B.Z. Feylezofê Yewnanî yê ku hizirîna felsefeyî ber bi çalakiya mirov û mirovan ve biriye. Sokrates, sofîst û kesên xwedî têgeha doxmayên teng û tund rexne kiriye. Li gorî nêrînên wî, ji bo rêveberiya dewletê divê mirov xwedî sinc be. Divê ev mirov û civak werin afirandin. Ji bo vê dibêje; **'xwe nas bike'**. Bi vê gotina xwe, dixwaze mirov bi zanabûna xwe ya mirovbûnê re tev bigere û hebûna xwe bi vê rêgezê eşkere bike. Lê bi vê tevgera xwe, bala hemû kesên desthilatdar dikişîne ser xwe. Kesên rayedar, bi angaştina ku sincê ciwanan xerab dike, wî dadgeh dikin û bi darvekirinê ve seza dibe.

Sokrates, li pey xwe tu belgeyên nivîskî nehiştiye. Bi nivîsên şagirtên xwe ve tê naskirin. Felsefeya serdema piştî xwe, bi giranî bandor kiriye. Sokrates, di dema **Perîkles** de jiyan kiriye. Ne ji malbateke navdar û dewlemend e. Di salên xwe yên dawiyê de wî û sê zarokên xwe zoriyên aborî jiyan dikirin. Sokrates, di ciwaniya xwe de di şerê **Samast (sîsam) û Peloponesesê** de cih girtiye û wêrekiya wî deng vedaye. Her çi qasî demeke kin di encûmena piştgiriyê ya Atînayê de cih girtibe jî, bi giştî bi ramyariya rojane re têkildar nebû. Lê car caran, di biryarên derveyî zagonê de cihê xwe girtiye.

Bi riya komara Atînayê a bi navê 30 tîranan ve hatiye xwestin ku tevî Sokrates çar kes ji aliyê rahîban ve werin girtin. Lê belê, Sokrates li dijî vê zagonê bi tundî derdikeve,

ev li gorî parastina Sokrates a ku **Platon** nivîsîbû. Piştre, bi vê tevgera xwe, jiyana xwe winda kiriye.

Di 403 B.Z. de beşên demokrat bi destwerdanekê, desthilatdariyê dixin destên xwe. Li gorî şîroveyên wê demê, tê gotin ku di nava wan kesan de yên ku derb xwarine, xwendekarên Sokrates in. Ew jî, hatiye sûcdarkirin û derxistine li pêşberî dadgehê. Bi giştî, sûc li hemberî Sokrates dihat bikaranîn.

Sokrates, ev sûcdarî hemû red kirin. Sokrates, bi henek û tinaziyên xwe, ew kesên ku ew sûcdar dikirin, gelek tengav dikir. Bi taybetî, serkêşê wan ê bi navê **Anutos** bi pirs û bersivên xwe yên tinaziyê, ew gelek tengav kiriye. Piştre, bi dibêtiyeke mezin li hemberî 220 dengan, bi 280 dengî sûcdar hatiye dîtin.

Dema Mirina Sokrates

Li gorî zagonên Atînayê, divê di 24 demjimêran de bi jehrê bihatana kuştin. Lê ji ber rojên pîroz ên bi navê Girava Delos ku her sal dihat kirin, kuştina wî mehekê hatiye paşvexistin. Ji bo wî, hatibû pêşniyarkirin ku were revandin. Lê gotiye ku her çi qasî ev biryar şaş be jî, divê biryara dadgehê were bicihanîn û biryara revê nepejirandiye. Roja dawî ya Sokrates û vexwarina wî ya jehrê, bi awayekî pir dewlemend û bêkêmasî di piraniya dewletê de hatiye vegotin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Sokrates, mirovên xwedî kîjan taybatmendiyan, rexne kirine?**
2- **Gotina Sokrates, aku dibêje; ‘xwe nas bike’ tê çi wateyê?**
3- **Çima Sokrates, ji aliyê desthilatdaran ve hatiye dadgehkirin?**
4- **Têkiliya Sokrates a bi ramyariyê re çawa bû?**
5- **Di encûmena dadgehê de Sokrates bi çend dengan tê sucdarkirin û çi encam tê dayîn?**
6- **Li gorî zagonên Atînayê, çima kuştina wî mehekê hatiye paşvexistin?**
7- **Roja dawî ya Sokrates, bi çi awayî hatiye vegotin?**

WANE 26

MANÎ- 1



Manî

Manî di 14’ê Nîsana 216’an P.Z. de li Mêrdînê ji dayîk bûye. Navê wî yê rastî nayê zanîn. Bi taybetî, ji ber ku bi zimanê aramî wateya navê wî; ronahî ye, di wê wateyê de hatiye bikaranîn. Her çi qasî tê gotin ku li Îranê ji dayîk bûye jî, di bingeha xwe de ji Mêrdînê ye. Ew bi xwe, ji aliyê aborî û civakî ve ji malbateke dewlemend e. Bavê wî, ji paytexta Medan Ekbatanê û dayîka wî jî ji xanedanên Ermeniyan e.

Malbata wî, di zanistê de xwedî asteke bilind e. Ev binesaziya civakî û malbatê, di teşegirtina hizirandina Manî de xwedî bandoreke mezin e. Bavê wî dixwest ku di warê olê de reforman çêke. Ev helwesta bavê wî jî, di hizirandina Manî de bi bandor e. Lê li ser hizirandina wî, çanda neolîtîkê jî gelek bi bandor bûye. Di wê demê de bi bilindbûna pergala baviksalariyê, êşa şer û windahiyan gelek zêde bûye. Li ser civakê her çi qas bandorên giran ên pergalê hebin jî berxwedaniya çanda komînal a demokratîk bihêz e. Diyar e ku vê rastiyê jî li ser kesayeta Manî gelek bandor kiriye.

Tundiyên li ser civakê, qedexebûn, dagirkeriya li ser keda mirovan, pîrozkirina samana taybet, bikaranîna kiryar û lîstokên qirêj, bi taybetî yên li ser koletî û kesayeta jinê, xerabkirina xwezayê û kuştina lawiran, di avakirina kesayeta Manî de bandorên mezin kirine.

Manî, xwestiye ku çandên Yewnanê(Helenîzm), Zerdeşt û Xiristiyaniyê di asta pêşdetir de bigihîne sentezekê.



Bingeha Manîzmê, li ser rêgeza Zerdeşt a başî û xerabiyê hatiye avakirin. Li gorî Manî, di gerdûnê de du rêgez serwer in. Yekem; ronahiya başiyê û ruh e, ya duyem jî; di xerabiyê de tarîbûn û beden e. Gerdûn bi xwe, bihevrebûna başî û xerabiyê ye. Ji ber vê sedemê, mirov jî; ji başî û xerabiyê, ango ji ruh û bedenê çêbûye. Li gorî wî, divê ew ruhên xerab ên ku di nava bedenê de hatine dîlgirtin, werin rizgarkirin. Di vir de armanca xwegihandina yekbûna têkoşîna başî û xerabiyê heye. Encax zanîna rast, dikare mirovan ber bi vê yekîtiyê ve bibe. Zanîna mirovan jî bi hezkirinê ava dibe. Hezkirin, wê di nava xwe de xerabiyê bide pişaftin û xwe bigihîne yekbûna mirovahiyê. Ji bo gihandina vê armancê jî, divê bi her awayî xwe dûrxistina ji derewkariyê çêbe û azwerî hebe.

Manî, di bingeha jiyana baş, rast û xweşik de zanîn û zanist bi cih kirine. Bi van kiryaran ve bi ceribandina reform û ronesansê rabûye.

Manî, ji alîgirê xwe re; semyanê taybet, xwarina goşt, vexwarina meyê(şerabê), zina, hevjînî(zewac) û girêdana bi cihekî ve qedexe kiriye. Xwestiye ku alîgirên wî, her tim di nava mirovan de bigerin, bi wan re gotûbêjê bikin û rastiyê bigihînin wan. Cîhana semyana taybet, bi tevahî qedexe kiriye. Girîngiyeke mezin daye parastina xwezayê û paqijiyê.

Manî, zêdetir bi şêweyê şivîlan(terîqetan), xwe bi rêxistin kiriye. Endamên şivîlê, her roj ji bo ku ji gunehên xwe paqij bibin; destmêj digirin û xwarinên xwe bi avê paqij dikin. Wekî din, meyê venaxwin û goşt naxwin. Her endam di zeviya ku jê re hatiye veqetandin de neçar e bixebite.

Ji wan kesên ku bi Manî ve girêdayî, zanista wî pejirandî û jê bawer kirine; kesên bijare dihat gotin. Di nava vê koma bijare de têra xwe jin jî hebûn. Nêzîkatiya Manî ya ji jinê re piranî azadîxwaz û demokrat bû. Jin û zilam wekhev didîtin û li gorî vê têkiliyê nêzîk bûye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Nasnameya Manî, diyar bike.**
2- **Rista bavê Manî ya di hizra wî de binivîse.**
3- **Di avakirina kesayeta Manî de çi bandorên mezin hatine çêkirin?**
4- **Bingeha Manîzmê, li ser kîjan rêgezê hatiye avakirin?**
5- **Li gorî Manî, di gerdûnê de kîjan rêgez serwer in?**
6- **Manî, ji alîgirê xwe re çi qedexe kiriye û çima?**
7- **Endamên şivîlê, ji bo ku xwe ji gunehan paqij bikin, çi dikirin?**
8- **Nêzîkatiya Manî ya ji jinê re çi ye?**

WANE 27

MANÎ- 2

Manî, pêxemberiya xwe di sala 242 P.Z. di dema Şapûrê Duyem de ragihandiye. Eşkere kiriye ku ew di ber ola cîhanî Manîzmê ku li cîhanê were belavkirin de berpirsiyar e. Manîzm, li Bakûrê Efrîqa, Îspanya, Fransa, Bakurê Îtalya û Balkanan nêzî hezar sal, bi awayekî berfireh hebûna xwe domandiye. Lê pêşketina xwe ya bingehîn, di xakên ku li ser jiyan kiriye li xaka Mezopotamya û Îranê de ye. Ji sedsala 10. û şûn de li Tirkistan, Bakurê Hindistan, Rojhilatê Çînê, ta Tîbitê hatiye belavkirin.

Şapûrê Duyem

Di romanan de tê eşkerekirin ku serwerên dema Manî û hevalbendên wî, bi awayekî bêmafî Manî surgûnî Rojhilata Asyayê dikin. Manî, li vê derê valahî nas nekiriye. Bi salan li vê beşa Asyayê geriyaye. Bi vê gerê re hizr û ramanên xwe belav kirine. Xwe gihandiye alîgiran û rêxistineke mezin.

Di dema desthilatdariya Sasaniyan de li şûna Şapûr, Hurmuzê Yekem tê erkdarkirin. Manî cardin vedigere Îranê û zanista xwe di nava gelê wir de belav dike. Ji bo xweşbîniya Hurmuz, nêzî salekê bi hêsanî xebitiye. Lê xwe bi paşkişandina Hurmuz re, ev dema hêsan hatiye qutkirin.

Li şûna Hurmuz, kurê wî Behram erk digire. Di dema Behram de cardin tundî û dijwarî rû dide. Manî, ji aliyê rahîbê wê demê yê bi navê Kartîran, dibe sedem ku Şahê nû, Behramê Yekem Manî bi dar ve bike.

Baweriya Manî, di sala 216 P.Z. de li hemberî xanedana Sasaniyan, weke tevgereke bîrdoziyê tê avakirin. Heger vê tevgerê karîbûya ew çîna rahîban derbas bikira, wê împaratoriya Sasaniyan jî, bi hêz bûbana û ta împaratoriya Roma bi bandora xwe ve nav û deng vedana. Ronesansa Ewrûpayê, dikarîbû weke meylekê bihata rûniştandin. Di vê wateyê de dikarîbû behsa sentezeke olî jî bihatana kirin. Bê guman, eger sentezeke wiha bihatana pêşxistin, wê bi dibêtiyeke mezin dîroka Rojhilata Navîn jî bi awayekî cuda, bi encam bibûna.

Fermanên pîroz ên Manî û pirtûkên wî

Piraniya kesên ku bi Manî ve girêdayî (murîd), ji guhdarvan pêk dihatin. Ev kesên ku di rastiya xwe de bi baweriya xwe ve hatine girêdan, bi deh fermanên Manî bi ola wî ve girêdayî bûn. Ev deh ferman, weke deh fermanên ola Cihûtî ya Mûsa ye.

1- Baweriyê bi dema borî (dîrokê) bikin.
2- Baweriyê bi pir xwedayan (dualizm)bikin.
3- Xwe ji derewan biparêzin.
4- Xwe ji xerabiyan biparêzin.
5- Goşt nexwin.
6- Bi çavên xwe xerabiyê li namûsa xelkê nekin.
7- Diziyê nekin.
8- Bixwînin û bi vê xwendinê re rastî û pîreseriyê ji hev derxin û nas bikin.
9- Di nava civakê de xwedî bawerî bin.
10- Di karê xwe de bêxemî û sersariyê nekin.

Pirtûkên Pîroz:

Pirtûkên pîroz ên Manî, şeş in û bi zimanê suryanî ne. Ev pirtûk, ji aliyê Manî ve hatine nivîsandin û nivîsarên pîroz in. Bi kurdî, pir zelal hatine wergerandin û nivîsandin. Ev

nivîsandina kurdî jî nasnameya Manî dide diyarkirin. Pirtûkên wî yên pîroz, ev in:

1. Şahberden
2. Sendoko jinê
3. Riya Rast
4. Olperestî
5. Veşartî
6. Nivişta Gernasan

Di Rojhilata Navîn de weke damezirînerê hunera wêneyê tê naskirin. Gelek berhemên wî yên nivîskî, ji aliyê dijminên wî ve hatine şewitandin. Lê hin pirtûk û nivîsên wî kêm jî bin, yan jî parçe parçe jî bin, ta roja me ya îro mane. Bi taybetî, bi lêkolînên destpêka sedsala 20. de gelek berhemên Manî û xwendekarên wî derketine holê. Lê mixabin, ev berhemên girîng û dîrokî ta niha jî di kevnarxaneyên Berlîn û Londonê de tên ragirtin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Manî, kengî pêxemberiya xwe ragihandiye û navê ola wî çi bû?

2- Dema Manî bi awayekî bêmafî surgûnî Rojhilata Asyayê bûye, çi kar kiriye?

3- Ola Manîzmê, li ku derê hatiye pêşxistin?

4- Manî, di dema kîjan împaratorî de tê bidarvekirin?

5- Fermanên pîroz ên Manî, binivîse.

6- Pirtûkên pîroz ên Manî, binivîse.

7- Manî, di Rojhilata Navîn de bi çi awayî tê naskirin?

FERHENGOK

A

Aforîzma: Gotinên kurt ên xwedî wate, yan jî bibandor ên ku kesek dibêje, da ku mirovên guhdar karên xwe baş bikin.

Alternatîf: Vebijêrk, ji çend tiştên ku mirov dikare yekê, yan jî hinekan jê hilbijêre.

Alîgir: Hevalbend, mirovê ku ramana kesekî dipejirîne.

Avantaj: Tişt û rewşa bisûd û raseriyê derdixe holê.

Azwerî: Dildarî, hezkirina zêde

B

Babek: Navê wî Babek Xeremî, ji xanedana Ebû Muslim Xorasanî ye.

Bendeke: Hevkêşe, yan jî hevsengiya du aliyên karanîneke bîrkarî, yan jî rewşekê.

Benî: Evd, xulam, kole

Bêkar: Mirovê bê kar.

Bîreweriya dahûranî: Zekaya analîtîkî

Bobelat: Bela, felaket, karesat, rewşa kembax û hwd.

Bûdîzm: Oleke nêzî 2500 salî beriya niha li Hindistanê ji aliyê Bûda ve hatiye damezirandin û niha li piraniya Asyayê belav bûye.

Brahma: Di wateyeke din de hindosî, ola ku li Hindistanê tê birêvebirin. Bingeha wê, nirxên sincî û giyanî li gorî rêgezên rêxistinkirî û zagonî ye. Rêza wê ya di cîhanê de piştî ola îslam û xiristiyanî ye. Li gorî gelê Hindistanê, Brahma xwedayê ku cîhan ava kiriye (Fîşto; xwedayê ku cîhanê diparêze û Şîfa; xwedayê ku cîhanê wêran dike ye).

C

Cinawir: Ajal, an jî mirovê pir tirsnak û hovane.

Ç

Çarenûs: Qeder, bext, şens

Çavberdan: Dema ku mirov çavê xwe berde li ser mal û rewşa kesên ji bilî xwe.

Çînperest: Dema ku çînek, di ser çîneke din, an jî gelek çînan re were girtin û dîtin.

D

Danezan: Daxuyanî, belavok

Dabeşî: Parçekirî, levakirî

Destdayî: A ku di cihê xwe de ye, guncav e.

Destwerdan: Dema ku bê destûr tevlîbûna karekî, yan jî rewşekê tê kirin.

Doxma: Mirovê xwedî ramaneke teng û tu ramanên din napejirîne.

Dêw: Heyîneke efsaneyî û hovane ye, sembola şer e.

Diyalektîk: Rêbaza rêvebirina hiş a ji bo lêkolînkirina rastiyan û nakokiyên wê, lêgera riyên derbaskirina van nakokiyan tê bikaranîn e.

Dualîzm: Pergala du xwedayan a başî û xerabiyê, yan jî tarîbûn û ronahiyê ye.

E

Entîk: Kevnar

Erdem: Dilpakî

Etnîsîte: Koma nîjadî

Î

Îdeal: Bêhempa, weke wê tune ye.

Îskenderiyê: Bajarekî li Misirê ye û li ber Deryaya Spî ye.

F

Federasyon: Yekîtiya ku di navbera çend dewletan, an jî herêman de tê avakirin e.

Feodal: Kesên xwedî erd, zevî û xulam.

Felcbûn: Şelel

Feylezof: Peyveke (filo-zofya) Yewnanî ye û tê wateya hezkirina zanînê.
Fînans: Pere, dirav
Fonksiyon: Erk, kar, xebat û peywir
Form: Şêwe, awa

H

Helenîzm: Serdema şaristaniya Grîk a di navbera salên 400-323 B.Z. yan jî serdema kevnar a Grîk. Li vir, çanda Grîk di warê zanîn, felsefe û raman de gelekî pêş ketiye.
Hemdem: Nûjen
Hemşerî: Mirovên ji heman bajarî, yan jî welatî
Hevbeş: Hevpar, hevpişk, pardar, di kar û xebatekê de bi hev re bûn.
Hevparî: Beşdarbûna karekî, yan jî ramanekê
Hoz: Qebîle

G

Garnîzonên leşkerî: Avahiyên leşkerî yên ku leşker lê dimînin û xwe tê de diparêzin.
Gernas: mêrxas, leheng
Gef: Metirsî, gotinên ku kesek dibêje ji bo kesekî din bitirse.
Girêdana xwînê: Weke di malbatekê de hemû endamên wê bi girêdana xwînê diyarker in.
Gordon Childe: Arkeoloxek Awûstiralî ye (1892-1957).

J

Jimaryar: muhasib, hejmarvan

K

Kapasîte: Jêhatîbûna têgihîştinê, sînorê vegirtinê.
Karesat: Bobelat, felaket
Karsaz: Mirovên ku projeya karekî pêk tînin.
Karîgerî: Pratîkî
Kast: Pergala cudabûnên civakî ya hindosan e û di girêdana xwînê de navdar in, ji ber ku yek etnîsîte ye. Perestin, zagon û aboriya wan; ji ya civakê cuda ye

Karakter: xislet, xulq, rewişt, avaniya xweser a tiştek an jî mirovek, şêweya helwest, hest û tevgera kes an jî komekê.

Kit û mit: Yeko-yeko

Komînalîst: Sosyalîst

Konfederasyon: Yekîtiya di navbera hin dewletan, yan rêxistinên siyasî, yan jî federasyonan de.

Klasîk: Kevnar, kevneşopî, tiştekî navdar ê kevnar, antîkî û bi nirx.

Kurewî: Cîhanî

L

Lahût: Peyveke Yewnanî ye û tê wateya zanista lêkolînên li ser xweda û çêbûna gerdûnê.

Lasayî: Teqlîd

M

Mag: Tê wateya mirovê ku xewnan rave dike, di zimanê erebî de tê wateya mecûs. Di îngilîzî de tê wateya macîk ango pîresêrkar.

Maket: Modela biçûk

Mazdek: Damezirînerê mazdekiyê ye, ji welatê pers e û oleke ji bingeha manîtiyê ya dijberî zerdeştiyê ava kiriye. Gotina wî ya navdar; hemû mirov weke hev in, jin, milk û pere, ji hemû mirovan re hevbeş e. Serdema wî, nêzî salên 500 P.Z.

Mezaxtin: Serfkirin, xerckirin

Mazdeîzm: Zerdeştî ye, tê wateya oleke kevnar a aryenan.

Mêtî: Rewşa mêbûnê

Mîtraîzm: Oleke ku ji navê Mîtra hatiye, ew xwedayê rok û zanînê ye û kurê Ahûra-Mazda ye. Ev ol, di dema Medan de ye û piştî zayînê li Romayê belav bûye.

Mîsyoner: Kesên ku di mijarekê de berpirsyar û erkdar.

Monarşî: Pergaleke desthilatdariyê ya bi awayê xanedaniyê ye, weke; împrator, qral, emîr, sultan…

N

Nîtçe(Nietzsche): Feylezofekî Cermanî ye (1844-1900) P.Z. navê wî Ferîdrîk Nîtçe ye, dijberî desthilatdarî û sîtemkariyê derketiye û mirov weke navenda gerdûnê dibîne, ji felsefeya Zerdeşt gelekî bandor bûye.

Nîr: Darê ku du ga û gamêş pê ve tên girêdan û pê cot tê kirin.

Nîrvana: Peyveke sensikrîtî ye û tê wateya kuştina ajoyên zayendî yên mirovan a bi riya êş û kûrahiya hizr û raman ta ku canê mirov ji bedena wî cuda bibe û bigihêje asta kêfxweşiyê.

P

Palpişt: Piştevan, piştgir, alîgir

Perestgeh: Cihê îbadetê, weke; mizgeft, dêr, laleş û hwd.

Pesinandin: Wesfdan

Pêşnûme: Reşnivîs, pêşxebata ku ji bo kar, proje û berhemekê tê kirin.

Piralîbûn: Gelek alî

Piştrast: Tekezkirin

Pîresêr: Sêhr, jinên ku bi karê sêhrê re mijul dibin.

Platon: Eflatûn, feylezofekî Yewnanî ye ku di sala 427-347 B.Z. de jiyaye (şagirtê Sokrates û mamosteyê Arîsto bû.)

Pratîk: Kar û xebatên ku li ber çav û ber dest tên kirin.

Proleterya: Serdestiya aborî û polîtîkayê ya çîna karkeran a li ser amûrên hilberînê û saziyên dewletê bi riya komînan û nûnerên hilbijartî.

Proleterên lumpen: Mirovên pêxwas û sêwlek, dema ku karê xwe li ser bingeha proleterya dike.

Payedarkirin: pilebilind, pileberz, payebilind

Pêngav: hemle, operasyon

Pût: Peykerên ku tên perestin, senem

Q

Qeyran: alozî, krîz

Qehreman: leheng, egîd, wêrek, bêtirs

R

Raberkirin: Pêşkêşkirin.

Rabirdû: Bûyerên ku di dema borî de pêk hatine.

Rant: Kedxwarî, bi keda kesekî din jiyankirin.

Rasyonel: Bi aqilî, bi awayekî rasteqîn, mantiqî

Raborî: Tiştekî ku di dema borî de hatiye kirin.

Reform: Guhartin, sererastkirin û xweştirkirin a ku ji bo anîna rewşeke baştir tê kirin.

Reformîst: Mirovên ku alîgirê reformê ne.

Rêdan: Destûr

Rojev: Bûyerên nû

Ronesansa Ewrûpa: Dema vejînê ya Ewrûpayê.

S

Saman: Sermiyan, reîs, serek, milk, mal…

Samanperestî: Mirovên ku hest û ramanên xwe li ser saman û pereyan dihizire.

Sasan: Şamanekî ji pers e, neviyê wî yê bi navê Erdeşêr di sala 227 P.Z. de xanedana bi navê sasan ava kiriye û di dema wî de ola zerdeştî ya ku qedexe bû, careke din fermî bûye.

Sentez: Çêkereke nû

Serdest: Serwer, serdar, fermandar

Serf: Koleyên ku hinek mafên wan ji koleyên din bêhtir in.

Serûbin: tevlîhev, belawela, berovajî kirin, jêr e jor kirin.

Sîmboyotîk: Hev temamkirin, bi awayê dualî sûd wergirtin.

Sofîst: Agahiya bibandor a nerast ku bi riya bikaranîna peyvên ku rastiyê diguhere û bersiva pirsan bi pirsan tê.

Stêrnasî: Astronomî, zanista tevgera stêrkan.

Sumerelog: Zanyarê/a ku dewleta sumeran lêkolîn dike.

Ş

Şamanîzm: Awayê yekem a baweriya mirovahiyê ye.

Şanaz: Serbilind, serfiraz, kêfxweş

T

Tekel: Yekdest, dema ku mirovek agahî, pîşe yan jî pêwistiyekê tenê ji bo xwe veşêre û di bin destên xwe de bigire.

Têkçûn: Îflas, şikestin, di karekî de bi ser neketin.

Tîran: zordest, zordar, diktator, stemkar

Tîk: Bi awayê stûnî

Tore: wêje, huner, zanîn û têgihîştin

X

Xwecihîbûn: Binecihibun, xwe li cihekî rûniştvan kirin.

Xweşbînî: musamaha, tolerans, her tişt biferaset pêşwazîkirin.

Y

Yeknesak: yekaheng, monoton, tişte ku qet naguhere û her weke xwe dom dike.

Z

Zayendparêz: Tenê zayendek esas girtin û ew di ser zayenda din re dîtin.

Zîgûrat: Di dema Sumeran de avahî û cihê rêveberiya jiyana civakî û bajaran, perestgeh.

BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

Hefte / Meh	Hefteya yekem	Hefteya duyem	Hefteya sêyem	Hefteya çarem
Rezber			Awayên çandên bingehîn ên mirovahiyê	Çanda klanê
Cotmeh	Çanda koçberiyê	Çanda jin û xwedawendê	Çanda hoz û eşîrê	Çanda parastinê û çêbûna etnîsîte û nasnameyê
Mijdar	Çanda şaman û rahîban	Derbasbûna serdema hiyerarşiyê	Derbasbûna civaka hiyerarşiyê	Çanda zîgûratê
Berfanbar	Çand û sincê bajêr	Çand û sincê bajêr	Çanda bajarên kevnar	Çanda bajaran di nûjeniyê de
Rêbendan	Çand û sincê dewletê	NIRXANDIN	BÊHINVEDAN	BÊHINVEDAN
Reşemeh	Zagon di dewletê de	Qirkirina çanda civakî	Li hemberî çanda koledariyê, çanda komînal	Berxwedanên hoz û eşîran
Avdar	Çanda Pêxemberiyê-1	Çanda Pêxemberiyê-2	Zerdeşt - 1	Zerdeşt - 2
Cotan	Bûda	Konfuçyûs	Sokrates	Manî - 1
Gulan	Manî - 2	NIRXANDIN		